

# Nûbihar

Mehnameya Çandı, Hunerî, Edebi



**GEREKE KURD Jİ  
BI MEKTEB Ü MEDRESE BIN**

# ALFABEYÊN LATÎNÎ Û EREBÎ YÊN KURDÎ

LATÎNÎ	MÎNAK	TIRKÎ	EREBÎ	MÎNAK
A a	Ard	Un	ا	نارد
B b	Bâş	Iyi	ب	باش
C c	Ceger	Ciger	ج	جهگەر
Ç ç	Çav	Göz	چ	چاف
D d	Dil	Gönül	د	دل
E e	Ewr	Bulut	ئه، ه	ئمور
Ê ê	Êş	Acı, sizî	ئې، يې	ئىش
F f	Fêkî	Meyve	ف	فېنىڭى
G g	Gund	Köy	گ	گوند
H h	Hingiv	Bal	ھ	ھنگەف
I i	Ixlamûr	Ihlamur	ڻ، ـ	ئخلامور
Î î	În	Cuma	ئې، يې	ئين
J j	Jin	Kadın	ڙ	ڙن
K k	Kulîlk	Çiçek	ك	کوليلك
L l	Lale	Lale	ل	لاله
M m	Mam	Amca	م	مام
N n	Nan	Ekmek	ن	نان
O o	Oflaz	Sevimli	ڻو، ڙ	ئوفلاز
P p	Paçık	Çaput	پ	پاچك
Q q	Qesr	Saray	ق	قدس
R r	Rojhilat	Doğu	ر	روزھلات
S s	Serok	Başkan	س	سمرۆك
Ş ş	Şil	Islak	ش	شل
T t	Tenik	İnce	ت	تەنك
U u	Universîte	Üniversite	و، وو	ئونىيقمىسيتە
Û û	Ülema	Ülema	نوو، وو	ئۇولەما
V v	Vexwarin	İçmek	ف	فەخوارن
W w	Wezîr	Bakan, vezir	و	وهزىز
X x	Xelat	Armağan	خ	خلات
Y y	Yezdan	Tanrı	ي	يىزدان
Z z	Zava	Damat	ز	زاخا

# Nûbihar

Mehnameya Çandî, Hunerî, Edebî

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3  
Fatih-Istanbul  
Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38

Xwedî  
(Sahibi)  
**Mahmut Yarluğ**

Berpirsîyarê Giştî  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
**Sabah Kara**

Berpirsîyarê Nivîsaran  
(Sorumlu Yazişleri Müdürü)  
**Süleyman Çevik**

Mudîrê Tîprêzî û Arşîvê  
(Dizgi ve Arşiv Müdürü)  
**Ali Karadeniz**

Muşawirê Nivîsaran  
(Yayın Danışmanı)  
**Mustafa Goyanî**

Nûbihar kovareke mehanî ye ku bi  
weşandina karpêkên çanda kurdî  
bi mana tevayî dilebike. Raman û  
rayêñ xwedyêñ karpêkan, lizû-  
men ne raman û rayêñ Nûbihar in.  
Nivîsâren ku bi îmzeya Berpirsîy-  
arê Giştî weya bi navê Nûbihar têñ  
weşandin raman û raya me nîşan  
didin. Nûbihar di serrastkirina kar-  
pêkên şandî de azad e.

**BEDELA ABONETIYA SALINÎ:**  
Li hundir: 180.000 TL  
Li derive: 60 DM

**JIMAREYÊN HESABÊ:**  
Li hundir: Postgiro (Posta Çeki):  
Süleyman Çevik, 658265  
Li derive: Süleyman Çevik, İş Ban-  
kası Yavuzselim Şubesi, 1079-  
30100-3118770

Tîprêzî (Dizgi):  
Nûbihar

Berg (Kapak):  
Dönüş

Çapxane (Matbaa):  
Nesil Matbaacılık

Hejmar: 15 • Sal: 2 • Çileya Pêşin 1993

# Naverok

**NÛBIHAR: GEREKE KURD JÎ  
BI MEKTEB Ú MEDRESE BIN.....3**

**LÊPIRSÎN: FEQÎ HUSEYN,  
ZEYNELABIDÎN ZINAR, İKRAMETTÎN  
OĞUZ, MEHMED UZUN, FIRAT CEWERÎ,  
ŞEYHO DUMAN, ATASOY MÜFTÜOĞLU,  
MÜFİD YÜKSEL, M. İHSAN ARSLAN,  
MUSTAFA GOYANI.....3**

**SABAH KARA: NAMEYÊN  
BÊCEWAB / 17-18 .....12**

**MELA QASIM: NUQRÛC / 13-16 .....13**

**SABAH KARA: PAREKENDE .....14**

**SEZAÎ KARAKOÇ / HOZAN OFLAZ:  
MONA ROZA / 3.....16**

**SÜLEYMAN ÇEVİK: İHMALKIRINA  
PIRSA KURDİ, BINKETIN E .....19**

**YÜNIS EMRE / HOZAN OFLAZ: NE  
MUMKIN E JI BÊHNA TE XWEŞTIR  
GUL Û REYHAN HEBE.....21**

**SABAH KARA: FERHENGA  
SEMANTÎK A ZIMANÊ KURDÎ .....22**

**MERYEMXAN: NÊÇÎRVANÊ DILQENC ..23**

**ALÎ KARADENİZ: BI MÜFİD YÜKSEL  
RE LI SER KITÊBA "KÜRDİSTAN'DA  
DEĞİŞİM SÜRECİ" .....24**

**GULBEHİST ŞIRNEXÎ: HEBÛN Û  
TENDURUSTÎ, İMTÎHAN IN.....29**

**XELÎL AMEDÎ: PÊXEMBERÊ DILOVAN .30**

**MELA MEHMÛDÊ YÛSIVÎ: EM  
MISLİMAN IN HEWAR! .....31**

**FERHENGOK .....32**



# GEREKE KURD JÎ BI MEKTEB Û MEDRESE BIN

## Nûbihar

**W**eye ku herkes zane, kurd di jiyanê de ji hemû hêlan feqîr û belengaz in. Piraniya wan, ji mal û milk, ji îlm û zanînê û ji xwendin û nivisan-dinê bêbehre û bêpar in. Kurd bêdewlet û bêkes in; bêradyo û bêtelevizyon in û hwd. Lêbelê ji van hemuwan muhîmtir; bêmekteb û bêmedrese, bêmamoste û bêşagirt in.

Erê; ji wan hemuwan muhîmtir... Lewra, bêyî mekteb û medresan, bêyî mamoste û şagirtan, ti tişt naçe serî. Lîwra yêñ ku pêşeroja miletekî ronî dîkin; mekteb û medrese, mamoste û şagirt in. Ne ku me yêñ din, weke ronakbîr û aliman, jibîr kirin... Lêbelê ronakbîr û alim jî ji mekteb û medresan dertên.

...

Kurd heta beriya bi çend salan, heger ne bi şiklê resmî be jî, xwedîmedrese bûn.

Di wan medresan de seyda, digel îlmên din, zimanê kurdî jî bi şagirtan hîn didan û kitêbên kurdî jî tedris di-bûn.

Bêguman, digel çeyî û spehîtiyên wan medresan, neçeyî û nerastiyên wan jî

hebûn. Lê bê şek û terdîd, çeyî û spehîtiyên wan, ji neçeyî û nerastiyên wan zêdetir bûn. Hetta meriv ka-re bibêje ku, heger iro edebiyateke me heye û zimanê me vê hêza xwe paraztiye, ev yek bi piranî, bi sayeta wan medresan bûye.

**Yêñ ku pêşeroja  
miletékî ronî  
dîkin; mekteb  
û medrese,  
mamoste û  
şagirt in.**

Me got, gereke kurd car-din bibine xwedî mekteb û medrese... Lê beriya her tiş-tî lazime em li tarîxa xwe binihîrin, ji paşeroja xwe istî-fade bikin û em bibînin ka yêñ berî me di vî warî de ci kîrine, ci rastî û ci çewtî di karê wan de hebûye. Loma, me ji hin ronakbîr û aliman pirs kir ku:


- Rewşa medresen kevin ên kurdî çawan bû?
- Iro kurd ji wan medresan çawan karin istîfade bikin?

Bersivêñ ku gîhiştin destê

me, em li jêr pêşkêş dîkin. Helbetê yêñ ku ne kurdî bûn, me tercumeyî kurdî kirin.

...

**"HEGER HEJMARA  
MEDRESAN BÊTE  
ZÊDEKIRIN, ÇARA  
KÊRHATINÉ HEYE  
Û PIR E JÎ"**



**Feqî Huseyn (Zimanzan)**

Berî damezirandina Ko-marâ Tirkîyê, medresenê Kurdistanê ji ali mîrekên kurd û tekyayêñ şêxan ve dihatine gerandin. Her çiqas beşek ji mîrekên Kurdistanê, derveyê xwe bi devleta Osmanî ve girêdayîbûn jî, lê di hundirê xwe de netewî û serbixwe bûn. Anglo dewleta Osmanî têkilê karê mîrekên Kurdistanê yêñ hundir nedibû. Ji

ber vê yekê, di medresan de çanda kurdî, bi zimanê kurdî dihate xwendin û nivîsandin. Her çiqas zêdeya pirtûkan bi zimanê erebî û farisî hatibûn nivîsandin, lê seydayan ew pirtûk bi wan zimanan dixwendin û bi wergerandine kurdî ji feqiyên xwe re digotin. Çand û zimanê kurdî, bi vî awayî tekûs xwe gihadine dema me, hemine ku bandûra medresan têde heye û giran e jî. Jixwe ji serdespêka ola (dinê) îslamê vir ve, mezrakên kurdan yên zanyarı, tenê medresen olî bûn. Ji medresan, zanayên mîna Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Şêx Ubeydullahê Nehrî, Bedîuzeman Seydayê Mele Seîdê Kurdi, Şêx Seîdê Paloyî û êd. derketine.

Her çiqas di dawiya sed-sala nozdehan de, mîrekên Kurdistanê ji himatê hatin rakin jî, lê xwanedaniya wan heya çarîka pêşî ya sedsela bîstan doman û heger weza jî be, karîn xwedîti li medresan bikin.

Piştî damezirandina Komara Tirkîyê û qedexekirina tekyan û medresan vêca seyda û gundiyyên kurd, di gun-dan de bi awayekî nîhanî medrese vekirin û gelek jî havil jê hatin dîtin. Dîsa sey (ders) û xwendin mîna berê didomand. Cardin mîna berê, mirovîn him oldar (dîndar) û him welatparêz jê derdiketin.

Piştî damezirandina imam-xetîban, medresen Kurdistanê pir kêm bûn. Anglo wi-san kêm bûn ku mirov dikare bibêje nemane. Heger hej-mara medresan bêne zede-kirin, çara kérhatinê heye û pir e jî.

•••

## “IRO PÊWÎST E KU REWŞENBİR Û ZANYARIYA KURDÎ, HEWLA XWE ZÊDE BIDIN SER WAN MEDRESEYAN”



**Zeynelabidin Zinar** (Nivîskar)

Ew medreseyen kevn ku li Kurdistanê hebûn, bi sed-salan jiyana xwe domandine û ji wan gelek mirovîn hêja yên sezayê pesnê û serbilindiya kurdan derketine. Her-weha ji wan hinekên wisa ti-jîfehm jî derketine, ku di nav alema îslamê de jî wek hîva çardehsevî îsiyane. Wek mînak: Mewlana Xalidê Kurdi yê hîmdarê duyemîn ê rîcîka Nexşebendiyê û Mele Seîdê Kurdi yê navdarê bi gundê xwe Norsê û hwd.

Ew medrese, beşek ji dîroka kurdî ne. Ne dîroka kurdî bêyî wan dibe, ne ji ew bêyî dîroka kurdî dibin. Lê ji bo naskirina wan, lêkolînine berfireh divê.

Ew medrese, rewseke xwe ya taybetî hebûn û ji aliyê kurdan ve gelekî pîroz dihate pejirandin. Rewşa wan ya aborî, bi temamî ji aliyê xelkê ve dihate kirin. Di wan de hertim fikra millî hebû. Lê bingeha wan li ser asasê olî

hatibû damezirandin.

Zemanê xwendina medreseyan, ji her feqeyî re di navbera pazdeh û bîst salan de diguherî. Ji xeynî pirtûkên kurdî, hemû ew pirtûkên erebî ku dihatine xwendin, ders-daran ew ji şagirtên xwe re tercumeyî kurdî dikirin.

Bi kurtî, medrese hêlinâ toreya kurdewariyê bûn. Di wan de, ji leyztikên kevnare bigir ta wergirtina kincêni millî, her xwe li jiyanê rakêş dikirin û nifş bi nifş diguhezîn. Bi giştî pir çak bûn. Lê wek sîstema xwe, aliyen ku rexne lê bête kirin jî hene.

Ji bo kurd ji wan medreseyan îstîfade bikin, pêwîst e pêşî wê sazgehê rind bina-sin. Ewçax îstîfadekirina jê, hêsan dibe.

Sed mixabin, iro hin profesorên biyanî jî hene ku ji wan medreseyan pir îstîfade dikin, lê kurd hindik dikin. Profesor Filiph gote min: “Ez ji wan medreseyen Kurdistanê re heyran dimînim. Niha ez rewşa wan, dersa xwendavanen xwe jî didim...” Lê xwendevan û zanayên kurd ên nû, ji salêni şestî û bi vir ve ti agahdariyeke zêde ji medreseyan nînin. Û hetta hinek hene ku wan bi “paş-verûti” û “kevnisperistî” jî ta-wanber dikin.

Bi bawariya min iro pêwîst e ku rewşenbîr û zanyariya kurdî, hewla xwe zêde bidin ser wan medreseyan û tiştîn hêja yên bi fayde ji bo xwe bi-neqînin û bikin bingeh.


Gava mirov bala xwe dide edebiyata piraniya miletan, tev domahiya dêrê, kinişte mizgeftê ne. Lê çîma wê kurd ji yên xwe dûr bikevin?

Niha gelek nav, peyy hene ku cuda-cuda têne nivîsan-

din. Lê ew tişt, di kilasikan de bi yek awayî hatine nivîsan-din. Lêbelê nivîskarên kurd ji wan agehdar nînin.

•••

### **"PARASTINA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ DE KEDA MEDRESAN PIR MEZIN BÛYE"**



**İkremettin Oğuz (Xwediye heftenameya Azadî)**

**M**eriv kare bibêje ku, medresen kevin ên Kurdistanê, ji bona pêşdebirina ziman û çanda kurdî, li gor mercen wê rojê, her yek mîna sazgeheke perwerdê xebitîne û ji ber vê rola wan, cihkî wan î girîng heye. Xusûsiyata herî girîng a van medresan jî, bi zimanê kurdî ders dana wan bû.

Tevî politikayêن asîmîlas-yonê jî, heta iro hebûn û parastina zimanê kurdî û ji nifşan heta bi nifşan gihîştina çanda kurdî de keda van medresan pir mezin bûye. Bi taybetî, kitêbên li ser edebiyat û zimanê kurdî ku piraniya wan ji terefê kesen ku ji medresan gihîştine hatine nivîsandin jî, vê yekê nîşan di-de. Rola medresan di gihîştina kesen mîna Cegerxwîn û Ehmedê Xanî ku ji bona gele

kurd hêjayiyek in jî, girîngiya medresan ji bona gelê kurd, nişan dide.

Ji hêla din ve, ji ber ku medresan li gor mercen wê rojê ji bona pêşdeketina ci-vakê mîna sazgehêن perwerdê fealiyet kirine, meriv dikare bibêje roleke mezin hilgirtine.

Girtina van medresen werê wesifdar, divê meriv mîna netîcak ji politikayên dewletê yên li dijê gelê kurd ve bi-hesibîne. Herçi bi bahana yekitiya perwerdê ve girtina van medresana dispêrin qanûna Tewhîda Tedrîsatê jî, sebeba herî mezin a vê qanûnê, hebûna medresen kurdî ye. Ew bi vê qanûnê, xwestin ku bi zûyî di van sazgehan de amojkariya zimanê kurdî bisekinînin û zimanê kurdî asîmîle bikin. Heger armanc ne ev bûya, divête ku iro bi hezaran medresen tirkî ku di bin siya dewletê de perwerdê dibin jî girtibûna.

Medresen me heger iro jî-mara wan hindik be û şaxêن perwerdê kêm bin jî divêt ji wan bête istîfadekirin. Lewra civaka kurd jî mîna civakên din ên dînyayê, ji cûr cûr si-nif, dîn, mezheb û ji mirovên xwedîdîtinên cûr bi cûr ava bûye. Ji ber vê, heger ne ji bo temama qisman be jî, iro ji bona civaka kurd, perwerda medresan hê jî girîngiya xwe muhafeze dike.

Gava ku rewş ev be, ji bo ku gelê kurd di têkoşîna netewî de serketî bibe, divêt li van medresan mîna berê bi çavên parçak ji sazgehêن têkoşîna netewî bête nihêrin û bi vê têgihiştiyê bêne qebûkirin.

Ji vê pêvtir, perwerdeya van medresan a ku di çarçu-

va dînî de tête dan jî, divêt ji civaka kurd re mîna dewle-mendiyekê bête qebûkirin.

•••

### **"EGER KURD HÊ JÎ XWEDIYÊ ZIMANEKÎ NIVÎSKÎ NE, EV BI XÊRA MEDRESAN BÛYE"**



**Mehmed Uzun (Nivîskar, romannivîs)**

**E**z ne ji nifşê dem û heyâma medresan im. Ji lew-re, agahiyê min ên li ser medresan, ne zêde ne. Ji bo hin xebatên min ên edebî, ez li ser medresen kurdî hûr bûme, min hin tişt xwendine û ez bi hin kesan re peyivîme. Ji tiştên ku min xwendine û bihîstine, ez dikarim vê yeka hanê derxim; eger kurd hê jî xwediye zimanekî nivîskî ne, ev bi xêra medresan bûye. Herwekî ku tê zanîn, di he-yamên kevn de, bi ma'na iro, li Kurdistanê xwendegeh nîn bûn. Di dewsâ wan de, medrese hebûn û kurd li medresan perwerde dibûn, li wan deran îlmê islamê, beşeriyetê, ebced û ziman dixwendin. Mele Mehmûdê Beyazîdî ku li ser adetên kurdan agahiyê pir hêja digihîne me, di kita-ba xwe Adetên Kurdistanê de, bi dirêjî behsa medresan

jî dike. Ew li derekî kitaba xwe weha dibêje; "Ji bo xwendina zarokan dayina seydayê weko romiyan resmekî muayyen nîn e. Cümalik, meaş û heftelik tu nîn in. Berê weko zarok verê kirin seydayî anegorê halê xwe hediyekekî didine zarokê ji bo seydayê dibin. Êdi tiştek tu nîn in, heta ku ew zarok xîtama Qur'anê bikitin. Weko ewî zarokî xitim kir, îcarê bav û diya wî zarokî rojekê gazî seydayê dikir, anegorê halê xwe du û sê û pênc pez û ya-xûd çelekekî didine seydayî, ew jî razi dibe. Wekî dinê dersêd kitêb û meşq ku di-kin, ewan seyda mexsan bi xêra xwe talîm didinê. Ucret nastînin... Û muderîs sibehan zû têne medresê û der-san dibêjin, heta nêzûkî evarê, paşê diçine malê xwe. İlla rojedî inê û sêşenban tatîl e. Muderîs naête medresê û feqî dersan naxwînin..."

Di van çendên dawîn de. Zeynelabîdîn Zinar jî, bi navê Xwendina Medresê kitabe-ke hêja weşandiye û tê de li ser medresan û xwendina medresê agahiyêن gelekî hêja hene.

Heta ev demên dawîn jî, salên 1950'an, medrese na-venda tevgera ronakbîrî ya kurdî bû. Edebiyata kurdî ya klasîk û nivîskî li wir dihate parastin, nivîskar û şahîrên nû ku bi kurdî dînîvisin ji wir derdiketin. Teví ku ders û xwendin li wir, bi piranî, bi zi-manê erebî bû, şerh, zanîn, izeh, axaftin û sohbet bi zi-manê kurdî bû.

Em dizanin ku kurd zêdê guhê xwe nadin tarîxa xwe û pêwendî di navbera dem, he-yam û nifşen kurdî de zêde ne xurt e. Gel û neteweyêن ku bi


qeheim li tarîx, reh û rêçen xwe xwedî derdikevin, bi ser dikevin û digihêñ armancêñ xwe. Yêñ din mahkûmê bin-destî, nezanî, belengazî û paş-temayinê ne. Tarîxeke kur-dan heye. Tarîxa ziman, ede-biyat û çanda wan jî heye. Û medrese di tarîxa ziman, ede-biyat û çanda kurdî de cihekî pir xas û giring werdigire. Hema ci bigire hemû nivîskar, şahîr û zaneyêñ klasîk ên kurdî, ji Eliyê Herîrî û Eh-medê Batê heta Emedê Xanî, Evdirehmanê Axtepî û Sey-dayê Cigerxwîn, feqe û sey-dayêñ medresan bûne. Berhem û eserêñ klasîk ên kurdî di medresan de hatine xwen-din. "Nûbihar" a Seydayê Eh-medê Xanî ku Kovara we jî navê xwe jê wergitiye, ji bo şagirtêñ medresan hatiye ni-visin.

Îro kurd behsa nûkirin û vejandina ziman û edebiyata kurdî dikin. Nûkirin û vejandin ê çawan were pê? Heta meriv xwe bi reh û rêçen xwe negihîne û bi wan re pêwen-diyeke gelekî xurt ava neke, ma meriv dikare ziman û edebiyatekê vejîne û nû bi-ke? Nûjenî, ne înakar e, ji ber-vajiyê, nûjenî li ser heyina kevnare, avahiyeke nû ye. Bi baweriya min, kurd divê, îro, pir bala xwe bidin ser med-resan, eser û berhemêñ med-resan, li wan xwedî derke-vin, li wan hûr bin û ders û tecrûbêñ wan veguhezinin nifşen roja me. Gelek seyda, melle û feqeyêñ medresan çî-rok, destan, efsane, serpêha-tî û şihîr nivisîne. Piraniya wan, ji ber sebebêñ nas, hê ronahî nedîtine. Ew genci-neyeke bêhempa ya ziman û edebiyata kurdî ne. Kurd divê bikevin pey wan, wan bibî-

nin, redekte bikin û biweşî-nin. Kitabêñ ku di medresan de dihatine xwendin divê, îro, bi çapêñ bedew û taybetî, te-vî şerhan, ji nû ve werin we-şandin, û gelek tiştêñ weha ku li hêviya ked û xebatêñ ronakbîrêñ kurdan in...

•••

### "DIBE KU NE JI VAN MEDRESEYÊN KEVIN BÜYA, ME Û İRO NIKARİBÜYA BEHSA EDEBIYATEKE KURDÎ YA KLASİK BIKIRA"



**Firat Cewerî** (Xwedî û Ber-pirsîyarê kovara **Nûdem**)

Wek tê zanîn, ci berî Cumhûriyetê, ci jî piştî Cumhûriyetê zimanê kurdî nebûye zimanekî fermî, dibistanêñ kurdan venebûne û perwerde bi zimanê kurdî nebûye. Lîbelê em dizanin ku lu Kurdistanê bi sed salan med-reseyêñ dînî hebûne; di wan medreseyan de mela û alimên dîndar hebûne û bi koman suxtê dane xwendin. Hem mela û alimên dersdar, hem jî suxtê û feqiyêñ ku li ba wan dixwendin an hemû kurd bûn, an jî piraniya wan ji kur-dan pêk dihatin. Hercîgas li medreseyan kitêbêñ erebî di-hatin xwendin jî, lê şirova kitêban bi zimanê kurdî bû.

Di van medreseyan de li ser dîn û kûraniya dîn, felsefe, astronomî û îlmê tasawufê dihate xwendin. Dibe ku ne ji van medreseyen kevin bûya, me ê iro nikarîbûya behsa edebiyateke kurdî ya klasîk bikira. Ji ber ku piraniya şâîrên kurd di wan medreseyan de gihane. Şîira kurdî ya klasîk ji wê kaniyê dizê. Ma ku ne ew medrese bûna, wê Melayê Cizîri, Feqiyê Teyran, Mele Ehmedê Bateyî, Ehmedê Xanî ji ku derketina? Wê Cegerxwîn ji ku bihata? Û bi sedan melayên welat-hez û şâîr ji ku derketina? Gava em navê alim û zanayê kurdan yên ku di medreseyen kevin de gihane, bi-hejmîrin, em ê bikaribin lîsteyike gelek dirêj derxînin. Heta nivşê niha, yên ku di zaroktiya xwe de çend salan li ba melan suxtetî kirine, wela-thezên baş in û gelek ji wan iro bi kurdî dînîsinin.

Lê bi avakirina Cumhûriyetê re Kemalîstan xwestine vê sîstema han ji navê rakin, di şûna wan de dibistanê xwe vekin, di dibistanê xwe de perwerdeyê têxine bin kontrola xwe, bi hemû awayî fikir û îdeolojiya xwe di na-va xelkê de belav bikin, gelê kurd ji kurdayetiyê bi dûr bixin, bike biyaniyê xwe bi xwe. Wek hûn dizanin, ev îdeolojiya han li ser înkariya ziman û hebûna me hatiye avakirin. Heta gelek kurdên ku paşê di van dibistanan de gihane û dîn bi tirkîtiyê ve girê dane, mîna tîrkan kurd înkîrî kirine, ummet xistine pêşıya milet û sed heyf û mixabin ku ew iro li defa zilm-daran dixînin.

Ji aliyên din ve jî, ez bawer im ku ne bi zora Kemalîstan

bûya jî, wê dîsan ev medreseyen han hêdî hêdî ji navê rabûna. Ji ber ku medreseyen di vî celebî de bi civata feodalizmê ve girêdayî bûn û bi pêşketina kapitalizm û bajr-vaniyê ve ew ê mecbûr bibûna û ji navê rabûna. Ji ber ku wan medreseyen kevin wê êdî nikarîbûna bi her awayî bersiva civakê bidana. Her-weha wê nikarîbûna ji bo pêşdexistina edebiyat, huner û kultura kurdî zêde roleke mezin bilistana.

Wek hûn jî dizanin, ku civaka kurdî di her warî de geleki li paş maye, ji bo pêşde-xistina vê civata lipaşmayî jî, divê xebatên geleki îlmî û nû-demî bêne kirin. Divê em tavilê sazgehêن xwe yên nete-veyî ava bikin, di van sazge-han de dest bi xebateke za-nistî û têkûz bikin û ji bo ci-vaka pêşerojê ya kurdan hîm û asasên baş û zexim biavêjin.

...

### **"HEGER HETA VÊ ROJÊ GELÊ KURD VÊ LAÎKTIYÊ QEBÛL NEKIRIBE, EV TIM BI XERA VAN MEDRESAN BÜYE"**

**Seyho Duman** (Alim û zi-manzan)

Medresen kevin ên Kur-distanê di famkirin û pêkanîna çanda İslâmî de ro-leke mezin hilgirtibûn. Îlmen ku li medresan dihatine xwendin, herçî ne tiştê îdeal bûn jî, dîsa jî bi rêbertiya wan, gelek pirsên İslâmî çareser dibûn. Ramana İslâmî bi awa-yekî zelal û ji gelek xurafa sa-fîbûyî bi destê van medresa-na gîhiştiye me.

Ev medresen li gelek gun-dan, her yek nola fakulteke İslâmî wezîfe dikirin. Ji ber

ku xelk li pey van medresan bû, medresan kirin ku İslâm di nav xelkê de cih bigre. Li medresan ji bona fîrbûna nassêن Qur'an û Hedîsê, ge-lek îlmên weke serf, nehîw, bedî', belaxet, me'anî, fiqh, hedîs, tefsîr, mantiq, helbest û hwd jî dihatine xwendin. Dibe ku li gor çaxê me rê û metoda hînkirina medresan di pêwîstiya İslahkirinê de be, lê ew bi muhtewa xwe ve, xîzmeteke mezin kirine. Fe-qîhîn ku ji medresê îcazet girtibûn, gava ku Qur'an dix-wendin, jê fam dikirin. Gava li pêşıya xelkê nimêj dikirin, qiraetê bi zanayı dixwendin. Zanîbûn ku ibadet divêt bi tenê ji Xwedê re bête kirin. Zanîbûn ku elaqâ dîn bi jiyna mirov re heye. Lewra Qur'ana ku di medresan de dihate tefsîkirin, van huk-man wisa tarîf dikir.


Serokê "dînê fermî" ji ber ku fonksiyona medresan a li ser civakê dizanîbû, ji bona ku vê fonksiyonê ji holê rake, ji dêvla wan kesen ku hem li camiyê meletî dikirin, hem li medresê dersdarî dikirin û hem jî ji bona ronîkirina xelkê dixebitîn, kesen ku ji îمام-xetîban mezûn, nezan, bêqî-raet bûn tayin kirin. Bi vî awayî, xebitîn ku van mer-kezén çandê yên tarîxî ji holê rakin. Hemû cehda wan, hîndana dînê fermî, lê rakirina her cûr perwerdeyên İslâmî bû. Bi vî awayî wê dînê fermî bibûna hakim û wê laîktî bi hêsanî cih bigirta.

İro gelê kurd bi awayên modern dikarin van medresana İslah bikin û demeke kin de van îlmên mûtad bidine xwendin û bi ve rîyê xizmetê bidomînin. Dikarin xwe ji tek-rara îlmên alet vegirin û ji

bona famkirina Qur'an û Hêdîsê giraniyê bidin îlmên din. Ji bona hêsankirina vana jî divêt ku îlmên fennî û tabîjî bêne xwendin. Ji bona ku ji berhemên biyanî bête îstîfâdekirin, divê ku zimanê biyanî jî bête xwendin. Bi vî şîklî, propaganda kesên ku ji bo dînê fermî û laîktiyê dixebeitin, wê li boşê derkeve. Heger heta vê rojê gelê kurd vê laîktiyê qebûl nekiribe, ev tim bi xêra van medresan bûye.

Meriv dikare bibêje, rêya çareserkirina vê drama ku îro li wê mintiqê heye jî, ev xu-sûsiyet e. Heger ew ê gelê kurd îslamê di jiyana xwe de serwer bike, divê ku Qur'anê rind bizanibe. Rêya vê jî, ji îslahkirina medresan derbas di-be.

\*\*\*  
**"HEMÛ MEDRESE  
MAZIYÊ TEKRAR  
DIKIN"**



**Atasoy Müftüoğlu** (Nivîskar)

Ez nikarim bibêjim ku bi rewşa medresên Kurdistanê ez rind dizanim; lê bi vê dizanim ku di vî qirnî de, li temama alema îslamê medrese bi alûle û derigirtibûneke cidî rûbirû hatine. Derbarê perwerdê û amojkariyê de med-

rese bi îsrareke mezin temsîla kevneşopiyê dikin.

Medrese hemû, tev ên Kurdistanê jî, bi şiklekî ku ji civakê re girtî bin, ava bûne. Ev avahiyana, qabiliyeta xwe ya nûkirinê, qabiliyeta peydakirina awayên nû, şîrove û zawiye û seyrên nû, winda kirin. Taybetiya mezin a medresen Kurdistanê ev e ku, dema li Tirkîyê, piştî 1923'yan, li hember hemû çalakiyên perwerdê û amojkariya îslamê, zordestiyên bênsaf û bêhempa dihatne kirin jî, medresen Kurdistanê bêrawestin xebatên xwe bêfasile domandine.


Ji sedsala 18'an ku çand û medeniyeta îslamê kete buhraneke mezin de û vir ve, hemû avahiyên alema îslamê, ruwê xwe li xwe zivirandine. Di vê dewrê de, di jiyana perwerdê û amojkariyê de şikilçitî, bû sisteme kar û xebatan. Jiyana fîkrî ya mislimanan di hinek qaliban de hate hişkîrin. Tinebûna rexnekirina ramanan û şikilçitî û qaideçitî; di warê exlaqî, civakî, ramânî û siyasi de, mislimanan ji pêşdeçûna fîkrî û siyasi mahrûm hiştin. Serwerbûna zîhniyeta şikilçitî ya zexim li ser ruhê lêkolînkar û munazerekar û li ser azadfikriyê, weke ku bandûr li civakên îslamê giştikî kiriye, werê li ser medresen Kurdistanê jî kiriye. Ji ber vê, kirdarên perwerdê û amojkariyê, bi tenê di yek rewşê de û yek alî bûne.

Civakên ku berê xwe li xwe zivirandine; bi kevnî, mazî, adet û toreyê nêziktir dîmîn. Civakên welê, pirranî bi hissiyatên xwe ve hereket dikin. Civakên torevan, ne bi hiş û zanyarî, lê bi hamasetê ve têne sewqirin. Di nav ci-

vakên îslamê de jî, ji ber ku adet û tore ketin şûna olê, gelên misliman di mijarê dînî de, rîbaziya teqlid û tekrarê ji xwe re kîrin adet. Mîxabin hê jî ev rîbazî li dar e.

Ev rastiyekî tarîxî ye ku avahiyên civakî yên kevneperist û torevan, nikarin bi hêsanî adetên xwe biterikînin. Di mîjveyîya gelê Kurdistan de, ji prensîbên îslamê pirtir, ji şêx û rîber û mezinîn terîqetê re itaetkirin, bala meriv dikşîne. Gava di nav civakên îslamê de, tekrar, teqlid û teassuba şikilçitîyê bûye adet; ew dewlemendiya zanyarî û hikmetê, ew hiş û zîhniyeta lêkolînvan, ew baweriya qewî û kirdara hişyar, ku di dema ewila îslamê de hebûye, zeif ketiye û her cûr ramana tenkîdî, hatiye kurt-kirin.

\*\*\*  
**"JI BONA İSLAHATA  
MEDRESAN, GEREKE  
PROGRAM Û  
BERNAMEKE NÛ  
WERE ÇEKIRIN"**



**Müfid Yüksel** (Nivîskar)

Medresen kurdî yên kevin, Mîna medresen zemanê Ebbasiyan, Selçûqiyan û Osmanîyan bûn. Yanê, berî hezar salî, medresen Kurdistanê

yên meselen li Diyarbekrê, Cizîrê, Mûsilê, Mehabadê, Tilloyê, Bedlîsê, mîna medresen Gêlê, Qonyayê, Îsfehanê, Şamê, Qeyseriyê û Nîşabûrê bûn. Ji ber ku Kurdistan parçek ji alema îslamê bû; milletê kurd jî ji medeniyyeta îslamê ye. Ferqa medresen me û gelên din ev bû ku, di medresen kurdan de beriya kitêbên erebî, nêzîkî deh-panzdeh kitêbên kurdî dihatin xwendin û piştî wan dest bi kitêbên erebî dikirin. Lêbelê weke îlmên dînî, fiqh, nehw, serf û mantiq; îlmê fennî, riyazi, felekî û hwd jî di wan de dihate xwendin. Ji medresen kurdî heta vî çaxî alim û mela zehf derketine; lê navê exlebê wan hatiye jibîrkirin; navê wan di rûpelên kitêban de mane. Mîna Mela Goranî, Şemsiyê Bedlîsî, Îdrîsê Bedlîsî, Mele Hesen Can, Ebul Ferec Îbin Elcewzî, Şêx Ebul Wefa, yan sahibê kitêba *Nuxbet el Fiker*, yan jî mîna Ebul Îzz Elcezerî sahibê kitêba *el Hiyel*.

Vê paşê îlm li medresen kurdan hindik bû. Piştî çend sedsalan ulûmên fennî, hêdî hêdî rabûn; ulûmên din jî hemma teqlidî man. Hejmara kitêbên rêtê yên ku li medresen kurdî dihatine xwendin zehf kêm bû. Hate hema nêzika pêncî yan şêşt kitêban û exleb îlmê nehwê hate xwendin. Loma ew dinamîzm çû, atalet kete cihê wê.

Beriya hatina Nexşebendîtiyê, medresen kurdî exleb li şehran bûn. Di gundan de medrese zehf hindik bûn. Lê piştî ku Nexşebendîti li Kurdistanê di nava gundan de belav bû, bi wasite Nexşebendîtiyê, xelkên gundan zehftir ji medresan istifade

kirin û te'sîra medresan li ser xelkê zehftir çêbû; îslamiyet di heyata civakî ya kurdan de, qewîtir bû.

Ji ber ku melan li gundan belav bûn, bûne reberê xelkê. Îcar bi vî awayî, rêya şer'ê bi xelkê didan naskirin û li gundan dindarî di nav xelkê de zehftir belav bû.

Îro medresen kurdî, her ci xeyli zeif mabin û te'sîra wan a kevin nemabe jî, hê di na va heyata civakî ya kurdan de cihekî mezin digrin. Li Kurdistanê, hê jî mela pir in. Dîsa li Tilloyê, li Diyarbekrê, Bingolê, Ayntabê, Mûşê medresen feal hene û tedrisat dewam dike. Lê mîna berê qîmet nadine wan. Lewra, êdî mektebên hemdem ên hikûmetê pir belav bûne; xelk zarwên xwe dişenine wan. Yek jî; exlebê kurdan li şehrîn xerba Anatoliyê de dijîn (rûdinê), mîna Stenbolê, Enquerê, İzmîrê yan Mersînê... Li ser vana jî te'sîra mueseseyen dînî roj bi roj këmtir dibe. Lê li Kurdistanê hê jî medresen muessîr hene; mîna medresen Mehabadê, Senendecê, yan ên Hewramanê. Ji ber vî awayî, em dikarin medresen kurdî dîsa ji berê rîndtir ihyâ û ava bikin. Gereke bernamake, programeke nû ji bona îslahata wan were çekirin. Di vê îslahatê de îlmên fennî û dînî bi hev re, bi rewş û usûleke taze divê ku werin xwendin. Ji xeynî vê, zimanê ecnebiyan jî; mîna Îngilîzî, Fransî jî mumkin e ku werin hînkirin. Lê gereke îlmên dînî dîsa bingeh bin. Ulûmê nû, yan ên fennî, divê nebin sebebê qetandina orf û enaneyî îslamî. Ko medresan bi rewşeke, bi bernamake baş werin îslahkirin yan

avakirin, dê qanûna tewhîda tedrisat jî fîilen were şkenandin. Hem muhafezekirin û belavkirina zimanê me yê kurmançî dê mumkin be, hem jî çanda me wê rewşa ji-yana me ya îslamî li Kurdistanê teqwyet bike. Naxwe di medresen kurdî de istifadekirina ji her cihetê içtîmaî û dînî û fennî, yan ferhengî, ko rîyeke baş were girtin dê gelek qenc be.

...

### “EW MUNASEBETA KU DI MABEYNA MEDRESÊ Û XELKÊ DE HEBÜYE Û DIYALOGA KU TASİREKE MUSBET LI XELKÊ DIKIR, ÎRO JÎ XURÛRÊ DIDE MIN”



**M. İhsan Arslan** (Serkê Giştî yê MAZLUM-DER)

Kes tineye nizanibe ku li her gundi camiye û bi camiya her gundi re jî medresak hebûye. Medresen ku ji zemanê Osmaniyan de berdewam dikirin û di dema Cumhûriyetê de jî, tevî ku bi gelek mani'an re rûbirû mane jî, dîsa hebûna xwe domandine, li gor min divêt meriv kitaban li ser fêde û gi-ringiya wan a li ser heyata civakî binivîse.

Li her gundi hebûna med-

resan dihate wê manayê ku li her gundî çend heb prefesor û textor jî dijiyan û li her gundi li miqabilê talîma sistêma îro, çend telebên ibtidaî û idadî û unîversitê jî dijiyan. Çunkî di her hucrên teniştâ camiyan de, tevî bêîmkaniyan jî, heftekê de şes rojan û her roj ji sibehê heta mexribê, bi şiklekî zexm, ji elîf bayê heta bi dersên fiqhê û tefsîrê û mantiqê û felsefê dihatine xwendin. Ew munasebeta ku di mabeyna medresê û xelkê de hebûye û ew destek û diyaloga ku tasireke musbet li xelkê dikir, îro gava ku ez lê difikirim ew hal hê jî xurûrê dide min. Ev avahiya ku bi gelek hêlê xwe ve mu-kemmeliyetê nîşan dide, bi sayeta fîkr û nîzama heyata îslamî ya bêhempa çêbûye. Xelkê medresan finanse dikirin û hemû ihtiyacê wan ji cem xwe tanîn cih; medresan jî li miqabilê vê, bêtëfrîq talîm û terbiyê didan zaroğan xelkê û ixtiyarên wan jî soffî û sahîbhîkmet dikirin. Ji xeynî malûmaten dînî, elimandina malûmaten dunyewî yên ku hewcedariyên wê rojê bûn jî îhmal nedikirin. Medrese weke ku ji hemû problemen xelkê re mercia fetwê bûn, problemen wan yên huquqî/edîjî jî derhalê de hel dikirin. Medresan fonksiyonên muhîm mîna ên civakî, iqtisadî û siyasî hilgirtibûn, bi şiklekî durust munasebeta mabeyna xelkê û dewletê /idareciyan jî dimeşandin.

Ev tiştên ku min piçkî ew

xulase kirine, divê ku ez bibêjim, mîsala wan encax li erda ku îslam lê hakim e meriv peyda dike. Bi vê sewiye û berdariyê, domandina heyata medresen kurdî, îrtibateke rasterast mabeyna wan û seyr û keyfiyeta medeniyéta îslamî û bi kêmanî tasîra fîra îslamî ya ku li ser xelkê ye pêk tîne. Dema ku xelîfe bi xwe ji aliman re, an ji şexulislam re itaetkar bû; dema mîrîn feodal ji şêxên wê herêmê re itaetkar bûn; û dema ku axayê gund ji xoçeyê medresê re itaetkar bû, di ji-



yanê de seyreke musbet hebû. Belê îro, ko medrese tenê fergehêن Qur'anê bin, ko xoce imam-xetibekî meaşdarê dewletê be, ko şêxên tonton di kaşanan de dest û dawêن xwe didin maçkîrin, ko xort li çiyê û axayê meaşdar jî bi seroktiya parêzgeran li gundan eşqiyatiyê bikin, ko reisê diyantê memûrê dewletê be, ko serokên dewletê bi içaze-ta Emerîqa welêt idare bikin; ne mumkin e ku meriv bi hêvi be. Dibe bibe meraq; ma munasebeta medresan û siyasetê heye? Li gor min, divê


ku meriv medresan, yanê mu-essesen talîmê, mîna sitûna heyata civakî binerxîne.

Bî baweriya min, îro waci'b e ku meriv medresan vejîne. Heger li fonksiyona ku berê medresan ifa dikirin bête meyizandin, wê ehemmiyeta wan rîndtir fam bibe. Medrese ne muessesen ku bi tenê kurdan ji wan istifade bikin, divê hemû misliman mîna ku medrese parçak ji heyata îslamî ne û qet' en ji îslamî nayen qutkirin, bimeyzênin û mutleqe ji wan istifade bikin. Dewlet ku çiqasî xurt be jî, madem ku nikare li her gundî universitekê çêbike, naxwe medrese her wextî wê lazîm û fonksiyonel bin. Hîç ti fakulte şûna medresen gundan zebt nake û ti universîte jî şûna medresa mehellî wê zebt neke û fêda ku ji wan bête hêvîkirin bi cih naynin. Ber'eksê unîversitên ku ji xelkê dûr in, awantaja bi xelkê rûbirûbûnê di destê medresan de heye. Ev xusûsiyet ji xeynî ciheta ci-vakî û iqtisadî, xusûsiyeteke muasir a siyasî jî dide medresan. Ev xusûs jî xuyaye ku ji bo mislimanan tê ci ma'nê. Medresen ku bi salan me wan îhmal kiribûn û hê nuh îro em ehemmiyeta wan ferq dikin, elzem e ku em wan îhya bikin. Çunkî civaka me bi heyat û tecrûba xwe dîtiye ku, xebatên ku ji xelkê dûr bin û yên ku xelk ne di navde bin û yên cihetekê wan a ilmî û tasîra siyasî nîn be û hedefa wan ne ev be, ew ti fêdê nagihînin xelkê. Berî ku

derengtir bibe, héger ji bo telafikirina vê ihmala me be jî, ez dixwazim vê ferziyetê bi bîr bînim ku divêt em camî û medresan vejînin û wan ji xwe re bikin qerargeh û fonksiyona wan zêdetir bikin.

•••

### **“ZANYARÎ Û REWŞENBİRÎ Û ÇANDA MILLETÊ KURD, DEYNDARÊ MEDRESAN Û FEQIYAN E”**



**Mustafa Goyanî (Muşawirê kovara Nûbihar)**

Kurdistanê de cihê feqîti û medresê li gora gelên misliman ên din, pir girîngitir û gelek bi siyanet û pişkdartir e. Belê mixabin dem û zemîna me dest nadit ku em vê yekê bi firehî diyarbikin.

Zanyarî û rewşenbîrî û çanda milletê kurd, deyndarê medresan û feqîyan e. Hunermend û edebiyatvanêñ kurd, berxwerê medresan in.

Programê medresê û pirtükên rêzê 70 % î (heftê ji sedî) ji aliyê zanyar û rêzmanvanê hucran û medresan ve hatiye hûnandin û bin gehkirin.

Hinek pirtükên rêzê bi zimanê kurdî hatine karbestin û rêzkirin. Îlmân rêzimanâ erebî, behrek mezîn bi saye-

ta alîm û rêzmanvanêñ kurd berfireh û pêşve çûye. Em dibînin rêzmanvan û hozan û hunermendêñ mezîn wekî Zemexşerî û Sibeweyhî û Elî Herîrî û Salah Şehrezorî û Mele Camî kurd in û van pir xîzmîta zimanê erebî û parşî kirine.

Li pêşya dem û dewra dewleta Ebbasî li hemî herêmên Kurdistanê de medrese û feqîti hatine karkirin û rêzkirin. Program û dersêñ medresan li hemî welatê Kurdistanê de wek hev in. Giraniya van programan li ser rêzimanâ erebî û îlmân ola îslamê ye.

Rêza xwendinê û rewşa feqîtiyê bi giştayî wekî jêrê de ye:

Li pişti xilaskirina xwendîna Qur'ana pîroz, feqîyan dest bi xwendîna Mewlûda kurdî û Nûbihara Ehmedê Xanî û Eqîda Xanî û Mele Xelîlê Gulpîkî dikirin. Duwazdeh pirtük li îlmê nehwê û şes pirtük li îlmê serfê de dixwendîn û metnê wan jiber dikirin. Gelek li ser metnê pirtûkan şerh, li ser şerhê haşîye û li ser haşiyê zeyl û li ser zeylê berkenar nivisandî bûn.

Li pişti serf û nehwê, îlmî iştîare, mentiq, meanî, bedî', wadi', arûz, kelam, fiqh, hedîs, tefsîr û tecwîd dixwendîn. Li pişti xilaskirina wan duwazdeh îlman, ıcazetname ji seydayê xwe distandin. Şađî û dîlanek mezîn dihate rêxistin û karkirin ji bo sex-medarya xilaskirna ewan duwazdeh îlman. Şaş û cubbe li ber digirtin. Belga ıcazê yađîgar digirtin. Li ewê belgê de navê seydayê wî û seydayê saydayê heta bigîhit Resûlê ummetê dihate zebtkirin û navê feqî ji dibû Mela.

Rewşa medresan de çar pêstirk û qonax hebûn. A ewil: suxteti; ya duwan: talibî; ya sêyan: musteîdî; û ya çaran: melatî bû.

Li pirtir gund û bajareñ Kurdistanê de medrese hebûn. Rêza xwarin û aboriya feqan li ser ratiban bû. Her malek rojê de danek ya du dan xwarin dişande medresê. Şagirtan (suxteyan) ratip di-anîn û talib û musteîdan der-sa feqîyan ji wan re tekrar dikirin. Her kesek siyaneta wan digirtin, cilê wan dişustîn û mesrefa wan pêk tanîn. Zanyarêñ mezîn rabûn ji wan medresan, lewra xwendîna wan sîrf ji bo bîr û bawerya îslamê bû.

Kêmasiya mezîn di wan medresan de; îlmân fennî û sin'at û teknîkê tine bûn.

Îro kurd dikarin pir bêr û kar bikin ji van medresan: Lewra gelê kurd bahra pitirî hê jî li ser bîr û bawerî mislimaniyê ye û hem jî medrese te'mînat û sexbêrî ye ji bo derdewama ziman û edeb û hunera kurdî. Lewra em dibînin, hemî rêzimanvan û wêjevan û hozan û gelek zanyarêñ kurdan, berxwarêñ medresê û feqîtiyê ne.

Kurd dikarin medrese bikin pêstirk û sêlim ji bo standina maf û heqêñ xwe yên merivahî. Divê nifşekê nû û zana kar bêxin ji bo standina welatê xwe û namûs û mal û ola xwe ji bin desten karbi-desten û faşîst û zaliman. Dikarin gelek Şêx Seîdan û Seyid Riza û Şêx Mehmûd û Salahaddîn û Şêx Ubeydullah û Xaniyan û Baban û Barzanî û Nûrî û Kawan û Teyran û Cizirî û Bateyî û Cîgerxwînan kar bixin û rakine li ser piyan. •

# NAMEYÊN BÊCEWAB / 17-18

## 7 Sibat 1992

Mecnûn'ê ku dilê xwe l'ber tava çolê hênik dike li kû ye  
Ez li kû me dema ku yar dibihure bi naz û eda ji nav tirban  
Canê ku kefen diçirîne û radibe li kû ye

Umrek dirêj dibihure çetela wî yek alî  
Bihîstin yek gotin yek hemû nalîn yek alî  
Hespê pêşbaziyê ye dil mehkûmê aşê avê  
Ez li kû me kehêlê nal safî ji zêr li kû ye

## 10 Hezîran 1992

Kaniya qurneşikestî ya meydanê  
Qehra qelişî ya hinar hinar  
Bedela huzna bîst û çar ayar  
Terekeya dileke şikestî

Ma sed li ber vê pêlavê disekeinin  
Hele kaşaneyên mûnîs ku li ber derya ne  
Mubtelayî çendîn û çend restorasyonan  
Dilek ku ji derve sor, mayinistan ji hundir

Û dibe ku baran dibare  
Li Bayezîd kevok nînin  
Ya şemate û baran  
Ma ez ê nuha bi vê tenêtiya xwe ci bikim

Meselen ez karim ji miroveke rêbiwer re  
Çavê te hene di bin birûyen te bibeji  
Ez karim sitiraneye mehzûn jî terennum bikim  
Helbet ku ez karim ti tiştî jî bikim

Ez karim dest bi helbesteke nû  
Bikim û dile xwe bilorînim  
Ci işe dildar heye li Bayezîd  
Ma ez ê li kû peyda bikim

Cinara wî aliyê behrê ci halî de ye gelo  
Ma huznê bêjing kirye û bêjinga xwe daniye alîkî  
Ci işe dildar heye li van deveran  
Ez heme û, huzn heye bi tenê

**Sabah Kara**

# NUQURÇ

## 13.

Dema ku ez zarok bûm, li wî bajarê xweşik  
Navê serokên dijmin, yan ker bû, yan jî dehşik  
Piştî van hemû salan, tiştek hate guhertin:  
Êdî bi zêrkurtan in, lê esl ew esl e bê şik

## 14.

Minbihîst Nuqurç'ê min li mero tehl hatine  
Gotî, qelem tûj kiriye, qaşo li benda min e  
Lawo dev ji zirînê berde, ey kerê keran  
Ma heta îro zirîn, ka bi kî, ci kirine

## 15.

Kuro wellah û billah ev ne demokrasî ye  
Eslê vê dezgeha te, daf û dizokrasî ye  
Ev heftê sal in ku tu bênamusiyê dikî  
Bes e lawo, daxwaza me heq û azadî ye

## 16.

Berya çend salan te d'got, “gereke tu wek min bî  
Li gor kitêbênecdad, tu şexsek modernistî”  
Lê l'dewran binhêr îro, li gor te “ez paş de me”  
Lê “helbet şik nîne ku, yê te tu reformistî”

**Mela Qasim**

# PARKE NDE

## Sabah Kara

### Rexneker û rexneber

Rexne, ji rexneber zêdetir, qîmeta rexneker nîşan dide.

...

### Tiştê ku di guhertinê de nayê guhertin

Li tiştê ku di guhertinê de nayê guhertin bigere.

...

### Kitêba qenc û neqenc

Kitêba ku te mecbûr nake tu cardin bixwînî, ew ne ti kitêb e.

...

### Zilma vî diyarî

Li vî diyarî zilm weke piyangoyê ye; wê kengî li te bixe, ne malûm e.

...

### Zarokuştin

Meriv cawa kare zarokan bikuje?

...

### Ser û şefqe

Hinin bi serê xwe difiki-  
rin; hinin bi şefqa xwe.

...

### Tefsîrên muxtelîf

Serê beran jêkir û got: "Çi  
heywanekî pîs... Destê min  
lewitand!"

...

### Qencî

Heger tu ê nebê serî, nax-  
we qencyî neke.

...

### Însan û mana

Insan ew e ku li manaya  
xwe digere.

...

### Hildana serê tijî û serê vala

Tu serê vala hilde nehilde  
çî fêde.

...

### Mukafat û ceza

Heger tu mukafatê nadê-  
yê, naxwe heqê te tineye ku  
tu cezayê bidêyê.

...

### Cawa sor a matador

Dijiminê eslî, tim dijiminên  
xeyalî dide ber me, da ku em  
bi wî re necengin. Weke ma-  
tador, cawa sor dide ber ga,  
da ku piştê lê bişkîne.

...

### Nietzsche li kê digeriya

Camus dibêje: "Nietzsche  
li Îsa'kî digeriya ku xwedyê  
dilê Sezar'kî be." Min li ber  
vê gotina Camus, noteke wi-  
sa nivîsandiye: **Naxwe li  
Muhammed digeriya!**

...

### Mexlûbiyeta mazlûm

Ey zâlim! Mexlûbiyeta me,  
ne kambaxî ye ji me re; û ne  
pîrozi ye ji te re.

...

### Kelaskirina Kurdistan

Heger em ê Kurdistan'ê  
bi kuştina zarokan xelas bi-  
kin, bihêlin bila Kurdistan wi-

sa bimîne.

...

### Hevaltiya Xweda

Heger Xweda **heval** ê  
min be, ez ê çîma hevalkî  
xwe winda bikim?

...

### Însan

Însan him ronî ye, him ta-  
rî; him bi hêz e, him bê hêz;  
him mezin e, him biçük.

...

### Nan û goşt

Hinin ji bo nan dişuxulin,  
hinin ji bo goşt.

...

### Cawa û çi

Ji hunermend re, **cawa** ji  
çî muhîmtir e.

...

### Tu û mirov û Xweda

Bi xwe re be; bi mirovên  
din re be; bi Xweda re be.  
Guh bide xwe; guh bide mi-  
rovan; guh bide Xweda. Bi  
xwe re bipeyive; bi mirovan  
re bipeyive; bi Xweda re bi-  
peyive.

...

### Azadiya mêtî

Ji bo însan ti tişt ji azadîyê  
muhîmtir nîne; azadiya  
herî muhîm jî, azadiya mêtî  
ye.

...

### Mermerê xam û heykel

Bûyerên ku qediyane yan

dinqedin, ji bo hunermend, weke mermerê xam ê heykeltraş in. Huner, nivîsandina van cûr bûyeran bi tenê nîne; lê ji van bûyeran weke mermerekî iştîfadekirin û jê heykelek çêkirin e.

...

### Tiştê ku meriv perişan dike

Du tişt meriv perişan dikin: **Ez karim her tiştî bikim. û Ez nikarim ti tiştî bikim.**

...

### Hînbûn û hîndan

Meriv bi nivisandina tiştina, bi tenê hîn nake; hîn jî dibe.

...

### Şarezakirin

Şarezakirin, ji eliman-  
din û hînkirinê hê çêtir  
e.

...

### Li kûderê û çawan

Ya muhîm, ne ew e  
ku, tu tiştê hê nehatiye  
gotin bibejî; ya muhîm  
ew e ku, tu **li kûderê û  
çawan** dibejî.

...

### Nivisandin û hînbûn

Meriv bi nivisandinê,  
ji xwendinê zêdetir hîn dibe.

...

### Kurd ci kes e

Tu bi axaftin, fikirin û ni-  
visandina xwe ya bi kurdî ve  
kurd î. Tu nikarî bi axaftin, fi-  
kirin û nivisandina xwe ya bi  
tirkî, yan bi zimanekî din bi-  
bî kurd.

...

### Azadî û çekdâri

Feylezofê fransî Alain tiş-  
tekî calib dibêje: "Xelaskin,  
azadkin û netirsin. Mirovê  
azad, wê dev ji çekan ber-  
de."

...

### Dizokrasiya Tirkîyê

Li Tirkîyê ne **demokrasî**  
lê **dizokrasi** heye; û ev **dizokrasi**  
li ser sê esasan bîna  
bûye: **Zêr, zor û tezwîr.**  
Yanê mirovan yan bi **zêran**  
dikirin, yan bi **zorê** bêdeng  
dikin, yan jî bi **tezwîrê** di-  
xapînin.

...

### Jiyan û xewn

Weke ku Shakespeare jî  
dibêje: "Jiyan û xewn, ji yek  
qumaşî ne."

...

### Azadfikrî û şubhe

Azadfikrî, berî her tiştî,  
xwe bi **şubhê** nîşan dide. Lê



gereke neyê jibirkirin ku **şub-  
he**, ne **weswese** ye. Lewra  
**weswese** zeîî û bêhêziyê nî-  
şan dide; lêbelê **şubhe**, delilê  
qewet û hêza eql e. Bi tenê  
mirovê dîn e ku bi her tiştî ba-  
wer dike û ji ti tiştî şubhe na-  
ke.

...

### Delîlên hovîtiyê

Montaigne tiştekî pir xweş  
dibêje: "**Înatçitî û zirtekî**,  
delîlên hovîtiyê ne. Ma kî ji  
ker emîntir, înatçitir, kibar-  
tir, ponijîntir, dilgiranir û ci-  
ditir e?"

...

### Qîmeta xwe jidestdan

Ko em qîmeta xwe ji dest  
nekin, **ti kes** nikare qîmeta  
me ji me bistîne.

...

### Xetta heyatê

Xetta heyatê geh bi jor de  
bilind dibe, geh bi xar de da-  
dikeye. Ma kes kare bi xettê  
**rast** bi tenê, wêne çêbike?

...

### Zemanê windabûyi

Zemanê hatiye windaki-  
rin, ne li **paş**, lê li **pêş** tête  
peydakirin.

...

### Rojhilat û Rojava

Li gor min **Rojava** tête  
manaya mirovên têr;  
**Rojhilat** jî tête manaya  
mirovên birçî. Loma Af-  
riqa Başûr, parçek ji Ro-  
java ye; lê dewletên Eme-  
rîqaya Latîn, digel vê  
qasê ku li wî aliyê din-  
yayê ne jî, parçek ji Roj-  
hilat in.

...

### Em û azadî

**Me** azadiya xwe ji dest  
da; ne **wan** bir.

...

### Dîwarê li dormadorê me

Mirov pêşî li dormadorê  
bajarê xwe dîwar çêdikirin,  
da ku **xwe** muhafeze bikin.  
Paşê li dormadorê hewşa xwe  
dîwar çêkirin, cardin da ku  
**xwe** muhafeze bikin. Lêbelê  
ev jî têra wan nekir. Dawî,  
her yek li dormadorê xwe dî-  
warên nayin dîtin çêkirin, car-  
din da ku **xwe** muhafeze bi-  
kin. Gelo piştî vê yekê, wê li  
dormadorê ci, dîwar çêbikin?  
Li dormadorê mîjiyê xwe?! Ü  
wê **xwe** ji kê muhafeze bi-  
kin? Ji **xwe**?!

Xweda çiqas rast gotiye:  
"Xweda jibîr kirin; Wî jî, nef-  
sa wan bi wan da jibîrkirin."

# MONA ROZA

## 3. Poşmanî û çileyan

Ba diweze, baran dibare, rovî diqutifin  
Darek êzing rihnî dike ocaxê  
Diya wî li ber agir perîşan  
Diya wî di nava agir de azad  
Ba diweze, baran dibare, rovî diqutifin

Baran di nava pişta wî û pişta min de ne  
Stran di nava lêvê wî û lêvê min  
Sirreke dîwane kir hezar parça dilê min  
Dengê wan têt dengê zarokên gunehkar  
Stran di nava lêvê wî û levê min de ne

Qama min jî kin, ya wî jî kin bû  
Ji ber ku min ji pora wî ya lûle lûle maç nekir  
Axa wî ya di vê ocaxê de dişewite  
Şewitand di xewna min de her şev destê min  
Qama min jî kin, ya wî jin kin bû  
Çavê min kesk in, çavê wî reş in  
Ez biqasî guneh spî me, ew bi qasî tewbê reş e

Di nava destê wê de ye serê diya wî  
Tiliya wê de hungulîskek ji rojê rihniyê wê  
Sûretek daleqandî ye li ber dîwar  
Rû bi mirêkê, bi şevê û bi dîrokê  
Di nava destê wê de ye serê diya wî

Devê tifinqekê li hewayê ye  
Dike ji nişka bêfîşeg biteqe  
Ez keçekte biçük im, ez keçekte dîn im  
Hun min ci fam dikin hun  
Tifingek dike ji nişka bêfîşeg biteqe

Keçên ku xwe bi pûsekê ve girtine  
Min wan kişand ji dawa wan  
Ez çi bikim sînga min bi bayê Qerecdaxê ve tijî ye  
Min ji diya xwe şîrê ewil li Geyve vexwar  
Roj li Ankara, li Çataldax daye ji zîndanekê  
Tiştek nemabû ez ê bimiryame bi dewsa  
Keçên ku xwe bi pûsekê ve girtine

Pisîk xaliyan parça dikin  
Rihniyeke sor dikeve erdê  
Derman nîne di çongê diyê de  
Serê diyê bûye du parça  
Agir nikare li rihê însan hukim bike  
Ba nikare li perda hukim bike  
Pisîk xaliyan parça dikin  
Guldankên di agir de gulê zer divekin  
Wek nanekî kizirî disekinin  
Dengên ecêb xerîb têne guhê min

Mirovên ku ji hêka çivik derdi Kevin  
Axur de hespekî zîn dikin  
Dengên ecêb xerîb têne guhê min  
Ez stranek im ez lorînek im  
Ez mûyek li rûyê Meryem im  
Nefesa ezîzek min difirîne  
Destê Xweda dilê min de disekinin  
Bi nexan girêdayî ne piyê min ê cîcî  
Welatê wî me ez, xurbeta xwe me

Ez hesreta ezîzekî me  
Ez mûya li ser lameya Meryem im  
Çavê min kesk in, erê çavê wî reş in  
Ez bi qasî guneh spî me, ew bi qasî tewbê reş e

Ocax ditefe, agir dibe xwelî  
Pora diya wî spî  
Diya wî pora xwe dipirtikîne  
Di nava agir de gul diveke, selwî mezin dibe, hevrist mezin dibe,  
zarok mezin dibe  
Ocax ditefe, agir dibe xwelî  
Diya wî rihê min de bi ser rihê min de dinixume

Tavek ku perrê mêsan germ dike  
Wê axê biqelêse û derkeve  
Heger jin bibêjin ku dijîn  
Heta ku bê stran bin nikarin bijîn  
Jinan, stran û dûpişk rihنâ dikin  
Jinan, stran û jehran rihنâ dikin

Êdî ez ê herim hesp bi zîn dikin  
Ez ê xatireyên xwe yeko yeko bişewitînim  
Ez ê kirâsê xwe pare pare bikim û  
Ji jîjoyêni bi jehr re bihêlim  
Ez ê derkevîm ser lateke spî û  
Guleke reş bi sînga xwe ve kim  
Ez ê bi alî tava diçe ava fişengan bavêjim û  
Xwe bi valahiyê de berbidim

Behrek ji bin piyê min ve diçe  
Ez keçekte biçük im, ez keçekte dîn im  
Hun min ci fam dikin hun  
Êdî ez ê herim hespê min dişehe  
Zarokek mûm dixwaze, miriyek stran dixwaze  
Behrek ji bin piyê min ve diçe, behrek  
Çavê wî bandikin min, ez nikarim bisekinim, nikarim  
Çavê min kesk in, ah çavê wî reş in  
Ez bi qasî guneh spî me, ew bi qasî tewbê reş e

**Sezai Karakoç**  
**Ji tirkî: Hozan Oflaz**

# KAMPANYA ABONETIYÊ

Yên ku di vê sala duyemin de bibine aboneyen Nûbihar,  
em ê kitêba **Nimêj Dikim** diyarî wan bikin.

**Bedela abonetiyê (Li hundir): 180.000 TL. (Li derive): 60 DM.**

**Ji hundir re, postgiro (postaçeki): Süleyman Çevik, 658265**

**Ji derive re, hesabbank (banka hesap numarası): Süleyman Çevik, İş Bankası:**

Yavuzselim Şubesi, 1079 - 30100 - 3118770

**Navnîşan:** Nûbihar, Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3 Fatih-İstanbul

**Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38**

# ÎHMALKIRINA PIRSA KURDÎ, BINKETIN E

## Süleyman Çevik

**H**eqê ti kesî tineye ku li gor xwe îslameke nuh damezrîne. Îslam bi hukmên xwe, bi edalet û wekhevi û rastiya xwe, li meydanê ye. Xwedê Teala, heqekî zêde nedaye ti kesan û xelkan; û ti millet li cem Rebbê Alemê bi îmtiyaz nîne. Her mislimanê rast, bi van rastiyen jî dizane.

Îslamê, heqê di her alî de wekhevbûna me û xelkên din daye me. Ev jî besî me ye. Em tiştên ku îslam red dike, naxwazin. Bi şiklekî din, em naxwazin hakîmiyeta kurdan li ser xelkên din ava bikin û ziman û çanda xelkekî qedexê bikin, ji masatê rakin û bi zorê bi wan kurdî bidin xwendin. Ev nijadperistî ye; îslam jî, vê nijadperistiya kirêt, red dike.

Heq û neheqî wexta werin cem hev, misliman bi feraseta xwe, tercîha xwe li ser heqiyê dike. Misliman ji bin tesîra her fîkr û ramanên xeyrî îslamî, lazim ê derkeve û kî zalim e, wî kesî eger bikaribe bi hal û hereketên xwe, nebe, di wîcdana xwe de mahkûm bike.

Kurd ûro ne xwedîyên mal û milkên xwe ne. Maleke wan tineye ku tê de star bibin.

Her roj di ajansên televîzyonan de, rojnaman de em dibînin ku kurd di perîşaniyeke nuh de dijîn. Yan ji welatên xwe koçber bûne, yan di welatê xwe de hatine kuştin; yanê tim û tim jiyaneyeke perîşanî didomînin.

Rayedarên Tirkiyê her ciyê Tirkiyê welatê kurdan ji dihesibînin; lê kurd ji hinek bajarên roava êdî têne qewirandin. Li her ciyên Tirkiyê bi piranî karêن giran û zehmet ûro li para kurdan ketine. Kurd û tirk di mesela ırqî de ti carî li vî welatî wekhev nebüne. Herdu xelkan jî, ji bona ku misliman in, pir zehmet û eziyet kişandine. Lîbelê kurdan, xeyrî mislimantiyê, ji kurdiyatîye jî pir kişandine. Feq û dolab û fîlbaziyên ku ji tarîxê heta roja ûro li serê kurdan geriyan e û diogerin, bêhed û hesab in.

Em ti carî înkâr nakin ku kurd li Tirkiyê ji bo çareserkirina pirsa kurdî, her dem hewcedarê desteka tirkan in û vê destekê nestînin jî, nikarin ji bin vî barî derkevin. Lî mixabin her roja ku derbas dibe, ji bo herdu xelkan jî, roj hê xirabtir û tarîfir dibe. Ji dêvla ku wê nola hev bifikirin, fîkrîn wan ji hev dûr dike-

vin. Çiqas ji xortêñ kurd û tirk têne kuştin, dijminahiyek di navbera van herdu xelkan de tête meydanê. Ev dijminahî ti faydê ne dide kurdan, ne jî dide tirkan. Jixwe dewletên ûrmezin ji bo ku ûrêñ xwe hê zêdetir dagirin, di navbera mislimanan de, ji bill fesadiyê ma ci kirine? Naxwe ji bo çareserkirina pirsa kurdî, em hewcedarê dostanî û hevaltiya tirk û ereb û ecemanın in jî.

Mislimanên Tirkiyê, di zemanê nêzîk de, bi piranî li ser pirsa kurdî ji rejîma Tirkiyê cuda nefikirîne û maziya wan di vê pirse de pir paqij nîne. Eger ji nezaniya xwe ye, eger ji sebebeke din e, mîna rejîmê li kurdan nihêriñe û li gor xwestinê û destûrên rejîmê hêreket kirine. Miletê kurd ji heqên maddî û manewî bêpar maye. Çand û ziman û navêñ wan qedexe bûye. Kurd, di welatê xwe de esîr û perîşan bûne. Lîbelê mislimanên tirk bi piranî ji van neheqîyan re bêdeng mane, bûne parêzkerên rejîmê û ji bo domandina rejîmê, bi ziman û qewet û bi duayêñ xwe bûne destek. Ev kesên misliman, di pir aliyan de li hember rejîmê derketine, lê

di hinek ciyan de, xusûsen di mesela kurdî de mîna rejîmê fikirîne. Dewletê jî li cihkî esasên îslamê ji holê rakiriye, li hember mislimanan ji bo pêşdebirina îslamê asteng derxistiye, li aliyek din îslameke nîvçê ji xwe re kiriye merdîwen û pê derketiye he-def û meqeda xwe.

Di her meselê de mîhenga mislimanan esasên îslamê ne. Kesênu ku xwe misliman qebûl dikan, mecbûr in ku vê heqî-qetê jî qebûl bikin û van esa-sana ji her cûr hereketêne xwe re bingeh bigirin. Tiştênu ku îslam dixwaze kesin yan jî rejî-min wan tiştana nexwazin, li ser misliman şert e ku xwe bi esasên îslamê ve girêde û li gor îslamê bimeşe.

Ya rast, di mesela kurdan de ji tîrkan pir kes tiştekî dirust nizanin. Nav xelkê tîrk de, ti kes ji zilm û tâdayiya ku kurd dikişînin xeberdar nîne. Îmka-na kurdan nebû-ye ku vê zilma ku dikişînin ji xelkê tîrk re bibêjin. Ji vê se-bebê em nikarin însanên wi-sa ku ji meselan bêxeberin tewanber jî bikin.

Îslamê ci heq daye miletên din, ewqas heq daye kurdan jî; ji heqê çandî heta heqê avakirina dewletê daye xelkê kurd jî. Lîbelê di pir hêlan de gava pirsa kurdan tê masatê mislimanen Tîrkiyê, îslamê jibîr dikan. (Helbet pir mislimanê tîrk hene ku, ew jî mîna me difikirin, em van kesana ji van gotinana tenzîh dikan.) Dewleta Federe ya Kur-

distana Iraqê, wexta li Başûr ûlan bû, li Tîrkiyê di nav kesen li hember vê dewletê derketin de, pir misliman jî hebûn. Eger dewleteke Tîrkî li wir ava bûbûya, ma ev kesana wê dîsa li hember vî işî derketana? Bêguman na.

Ji mislimanan pir kesan pirsa kurdî iro ji grûbênen çep re terk kirine, xwe bi vê pirsê naêşînin û vê pirsê ji xwe re tew nakin derd. Carna xwe dirêjî Filipînê dikan, carna li Keşmîrê ne, carna li Filistîn in û carna jî xusûsên ciyê ku tîrk lê dijîn; li Azerbeycan û Qerebax in. Ev ciyê ku me-jimartin, tev tê de birayêne me

dikan. Berî 12'ê İlonê, parastina heqê karkeran, karû-barê kesen çep bû. Yek mislimanekî rabûna heqê karke-ran biparista, ew mislimana bi komunîstiyê sucdar dibû. İro jî, ev mantiqâ heye. Yek rabe heqê kurdan biparêze, rasterast di çavêن van kurt-bînan de dibe PKK'cî. Kesen bi vê mantiqê difikirin, di nav cemaet û komelan de belav bûne.

Tiştê çewt û xirab, di pa-şila heqperestan de nayêñ veşartin. Kesê ji bona xwe behsa heq û qenciyê bike, ji xirabî û neqencyê li ser kesen din re jî nikare bêdeng bimîne. Ev kesa, eger misliman be, di meseleke wuha de wezîfa wî hê jî girantir dibe û lazim e zedetir heq-perest bibe.

Misliman bi dev û hereketêne xwe, li hember her cûr mirovan; ci misliman bin, ci ji dîneke din bin, lazim e heqperest be.

Ne ti carî zilma li ser xwe qebûl dike, ne bi xwe li kesî zilmê dike û ne jî zilma li ser mirovîn din qebûl dike. Misliman eger birayê wî li ser kafirekî zilmê bike, nikare ji zilma birayê xwe re jî bêdeng bimîne. Lewra dînê mazlûman ci dibe bila bibe, ji bo piştgirî û destekirina mazlûman, tiştê lazim û şert, mazlûmiyeta wan kesan e. Parastina heqên mazlûman û derketina li hember zaliman, destûreke îslamî û însanî ye. •



yên misliman di zilman û şertên giran de dijin. Ev sed sal e ku gelê kurd zilmê dikişîne, lê nizanim çîma bala van mislimanan nakişîne? Ni-zanim çîma navê Kurdistan li wan tûj û tirş tê? Derdê kurdan ji xwe re nekirine derd, mislimanen ku li ser perîşaniyeta kurdan diseke-nin jî, wan kesana bi PKK'cîtiyê sucdar dikan. Mantikeke wisa teng û dîtineke bêferaset tine ye. Xelkekî misliman di nav agiran de maye, em jî bi navê mislimantiyê wan ji xwe dûr dixin û teslîmî kesen din

# NE MUMKIN E JI BÊHNA TE XWEŞTIR GUL Û REYHAN HEBE

Ê ku carkê te bibîne  
Hemû umr te jibîr nake  
Wê jibîr bike her dînî  
Tu ê bibe tesbîha wî

Zahidê ku taet dike  
Ko çavê wî bi te keve  
Wê jibîrke tesbîha xwe  
Û wê bi secdê bikeve

Ê ku şekir di dev de ye  
Dema çav bi te bikeve  
Wê jibîrke şekirê xwe  
Ku bimije yan jî bixwe

Ev evîna min a bi te  
Ko bixwazin qîmet bikin  
Heger milkê du cihan  
Bidin jî têra wê nake

Heger ku du cihan tijî  
Bi bax û bostanan bin jî  
Ne mumkin e ji bêhna te  
Xweştir gul û reyhan hebe

Ger horiyên heşt cennetan  
Arastinî bi vir de bêñ  
Dilê min ji eşqa te qet  
Eşqeke dinê naxwaze

Bêhna gul û reyhanan tev  
Ji aşiqkî re maşûq in  
Maşûq ji ber çavê aşiq  
Ne mumkin e winda bibe

Dema Îsrafîl li sûr xist  
Hemû mexlûqatî rakir  
Guhê min ji bil dengê te  
Dengê ti kesî nabhîse

Heger zuhre j'asman bê  
Û tembûra xwe newaxtke  
Tê cardin işreta min be  
Çavê min ji te qut nabe

Êz ê bi xanûman çib'kim  
Du cihanêñ bê te çib'kim  
Tu ji herduwan çêtir î  
Bila kes ji vê şik neke

J'dema Yûnis hij te kirye  
Can bi mizgînî têr kirye  
Her dem jiyanke nû de ye  
Ku nizane kevnbûn çiye

**Yûnis Emre**  
**Ji tirkî: Hozan Oflaz**

# FERHENGA SEMANTIK A ZIMANÊ KURDÎ

## Sabah Kara

**armanc** (:hedef, amaç, gaye, fikir. **amaç** a ku tirkî de jê tê istîfadekirin, a me ye.) Parsî: **amac** (:nişan alınan yer, hedef, amaç) İngilîzî: **aim** (:amaç, nişan almak, amaç edinmek, hedef)

**armancgeh** (:nişangah, hedef alınan yer) Parsî: **amacgah** (:nişangah)

**arzû** (:arzu, istek. **arzu** ya ku tirkî de jê tê istîfadekirin, a me ye.) Pehlewî: **arzok**, an **arzûk** (:istek, dilek, sevgili, arzu) Parsî: **arzû**, an **arizû** (:umut, istek, arzu, dilek)

**asan** (:kolay) Pehlewî: **asan** (:kolay, olabilir, sıkıntısız) Parsî: **asan** (:kolay) İngilîzî: **easy** (:kolay) Fransî: **aisé** (:kolay)

**asayış** (:asayış, barış. **asayış** a ku tirkî de jê tê istîfadekirin, a me ye.) Pehlewî: **asayışn** (:asayış) Parsî: **asayış**. İngilîzî: **peace** (:barış)

**asık<sup>1</sup>** (:mide) Pehlewî: **eş-kemb**. Parsî: **şikem**. İngilîzî: **stomach**. Fransî: **Estomac**.

**asık<sup>2</sup>** (:ceylan) Avestayî: **asu** (:hızlı giden) Sanskirîtî: **asev**. Pehlewî: **ahûk**. Parsî: **ahû**.

**asîman**: (gök, sema) Aves-

tayî: **esmen**. Pehlewî: **as-man**. Parsî: **asman**. İngilîzî: **sky**.

**asîw** (:bela, felaket, afet) Parsî: **asîb** (:dert, sıkıntı, bela, ziyan, darbe)

**astan** (:bölge) Parsî: **astan**, an **astane**, an **stane** (:dergah, eşik) İngilîzî: **section** (:bölge)

**astar** (:elbise veya yatakların iç yüzü, astar. **astar** a ku tirkî de jê tê istîfadekirin, a me ye.) Pehlewî: **aster**. Parsî: **aster**.

**asîde** (:tenha, yalnız, rahat) Pehlewî: **asuten** (:istirahat, sakinleşmek, dinlenmek) Parsî: **asûde** (:zahmetsız, dalmış, uyumuş) İngilîzî: **ease** (rahat) Fransî: **aïses**, an **aisé** (:rahat)

**aş<sup>1</sup>** (:değirmen) Pehlewî: **asyap** (:yuvarlak taş ve bu taş sayesinde tahılı un haline getirmeye yarayan alet, değirmen) Parsî: **asya**, an **asyab**, ji terkîba **as+y+ab** (:taş+su, su taşı, su değiirmeni)

**aş<sup>2</sup>** (:yemek. **aş** a ku tirkî de jê tê istîfadekirin, a me ye.) Sanskirîtî: Ji kokê **ad** (:yemek) û bi şiklê **as** (:yemek). Latînî: **edo** (:yemek) İngilîzî: **eat** (:yemek) Alamanî: **essen** (:yemek) Parsî:

**aş** (:yemek)

**aşifte** (:perişan, fahişe) Avestayî: **axšeob** (:muzdarip olmak, tâhrik olmak) Sanskirîtî: **ksobhate** (:öfkelenmek, heyecanlanmak, devrim) Pehlewî: **aşoften** (:perişan olmak, çatışmak, öfkelenmek) Parsî: **aşuf-te** (:perişan, perişanlık, aşık) Fransî: **accablé** (:perişan)

**aşitî** (:barış) Pehlewî: **aştîh** (:barış, huzur, savaşın ziddi) Parsî: **aştî** (çatışma ve çekişmenin sonunda anlaşma ve uyuşma, dostluk, barış)

**aşıyan** (:yuva, kuş yuvası) Pehlewî: **aşeyene** (:yer, saray) Ermenî: **şen** (:köy) Parsî: **aşıyan** an **aşane** (:yuva, kuş yuvası, ev, sığınak) İngilîzî: **shelter** (:sığınak) Fransî: **asile** (:sığınak)

**aşına** (:bildik, tanıdık, aşina. **aşına** ya ku tirkî de jê tê istîfadekirin, a me ye.) Avestayî: **axşna** (:tanımak) Pehlewî: **aşnak**. Parsî: **aşına** (:yabancının karşıtı, dost, arkadaş, tanıdık, tanıyan, aşina) İngilîzî: **acquaintance** (:tanıdık, aşina)

**av** (:su) Avestayî: **ap**. Sanskirîtî: **ape** an **ap**. Pehlewî:

**ap.** Parsî: **ab.** İngilîzî: **wa-ter** (:su) an **sap** (:bitki öz-suyu) Fransî: **eau** (:su) **ava** (:bayındır, mâmûr) Pehlewi: **apaten** an **apat**. Parsî: **abad** (:kurulu, bayındır) **avdest** (: abdest, **abdet** a tirkî de jê tê îstîfadekirin, a me ye.) **av+dest** (:su+el) Parsî: **abdest**. **avêtin** (:atmak, savurmak) Pehlewi: **hendaxten** (:acele etmek, hûcüm etmek, düşmek) Parsî: **endaxten** (:atmak, savurmak) **avis** (:gebe, hamile) Avestayî: **apusra tenu** (:bebekli, gebe) Pehlewi: **apusten**. Parsî: **abisten** (:gebe, hamile) **awaz** (:ses, bağıriş, seda, gürültü, çığlık) Avestayî: **wec**

an **wek** (:söylemek) Sanskritî: **wac**. Pehlewi: **waj**, **wajek**. Parsî: **awaz** (:ses, çağrı, yüksek sesle bağıriş) Latînî: **vox**. İngilîzî: **voise**. Fransî: **voix**. **ax** (:toprak) Pehlewi: **xok**. Parsî: **xak**. **axur** (:ahır, **ahır** a tirkî de jê tê îstîfadekirin, a me ye.) Pehlewi: **exwer**. Avestayî: **akwere**. Parsî: **axur**. Fransî: **écurie**. **ayîn** (:dua, ayın, **ayin** a tirkî de jê tê îstîfadekirin, a me ye.) Pehlewi: **ayên** an **advên** an **ayîn** (:bakış, görüş) Parsî: **ayîn** (:zinet, süs, adet, tarz) **azad** (:özgür, azat, **azat** a tirkî de jê tê îstîfadekirin, a me ye) Avestayî: **zate** (:asil, soylu, şerefli) Pehlewi:

wî: **azat**. Parsî: **azad**. **azadî** (:özgürlük) Pehlewi: **azatîh**. Parsî: **azadî**. **azar** (:aci, eziyet, sancı, azar, **azar** a tirkî de jê tê îstîfadekirin, a me ye.) Pehlewi: **azar**. Parsî: **azar**. **azman** (:gök, sema) Avestayî: **esmen**. Pehlewi: **asman**. Parsî: **asman**. **azmûn** (:imtihan, deney, tecrübe) Pehlewi: **azmayışan** an **uzmayışan**. Parsî: **azmûn** an **azimûn**. İngilîzî: **examination**. Fransî: **examen**. Alamanî: **exam-en**. **azwer** (:muhterîs, hırslı) Pehlewi: **azwer**. Parsî: **azwer**. İngilîzî: **avaricious**. **azwerî** (:hırs, tamah, aç gözülüklük, ihtiwas) Pehlewi: **azwerîh**. Parsî: **azwerî**.

# NÊÇÎRVANÊ DILQENC

## Meryemxan

**W**extekî zehf berê de, di gesreke mezin de sultanek jîiyaye. Weztreki wî sultani hebûye, navê wî Nasruddin bûye.

Nasruddin zehf hezneçir bûye. Heftekî de ya hindik ku ca-rekê neçîta neçîre, nekaribû li cihê xwe bisekinita.

Rojekê ji rojan Nasruddin disa derketiye neçîre. Cûye na-va dahleke tiji hêşnahî û dar û ber. Dema li heywaneke ku binêçire geryaye, nişka ve xezaleke çelik hatîye rasta wî. Xezaleke geleki piçûk û şînîn bûye. Ji sekna wê kifş bû ku hê nû bi ser piya ketiye.

Xezala piçûk, pêşî bi awireke bêtewane temaşeyî Nasruddin kiriye û pişt re hedi hedi dest bi revê kiriye.

Wê gavê kurê Nasruddin ketiye bîrahiya wî. Dilê xwe de arzûyeke mezin his kiriye ku vê xezala çelik bigire û ji kurê xwe

re bibe.

Gavekê de xezala piçûk git-tye. Bi nazîkî xezale dixe hembeza xwe û li hespê xwe siwar tê û reya qesrê digre.

Nasruddin reya qesrê git-tye ya gitinê, le xezala dêl.. Serê xwe radike, der û dora xwe temâse dike lê çelik xwe nabîne, vê re diperpite. Vir de direve, wirde direve, hew dibîne ku çelik wê di hembeza Nasruddin de ye. Jan dikeve dilê wê û bi dengekti şewat dikale.

Nasruddin, hembeza wî de xezala çelik, ser pişta hespê xwe bi şahi dile. Wê gavê dengekti şeh dike, digel vê sehkîrinê temaşeyî pişt xwe kiriye. Xezala de dibîne. Dittin û hilbûna wî bûye yek. Xezala de blî çavên masûm û mehzûn temaşeyî Nasruddin dike û blî daxwaza çelik xwe diperpite.

Pêşbera vê manzerê (dît-

bare), dilê Nasruddin şewitiye. Seba ku xezala çelik ji maka wê qetandîye poşmantî ketiye dilê wî. Çelikka xezale hedi berdaye, xezela çelik dema ku ser-best maye, wê gavê de reviye-re rex makan xwe...

Dilê xezala dê ji, yê çelikê ji ji ve azadiye gelek geş bûye. Ji kîfa hindik mabû ku bifiriyanâ. Herduka çindik dane xwe û bi dilxweşî ve revîne nav daris-tanê de.

Gavakê xezala dê sekiniye û bi çavên birqin temaşeyî Nasruddin kiriye. Ev temaşekîna birqin û germ û dilges, weke spasekê bûye ji Nasruddin re.

Nasruddin şeva wê rojê, xewna xwe de mirovîk rû nûranî dibîne. Ewi mirovi gotiye wî: "Nasruddin, dê rojek bê tê ji bibe sultan."

Rojekê ev xewn bûye rast û Nasruddin bûye sultan.

Zarokên xoşevist, bizanîn ku insanê li hemû mexlüqatan re qenciyân bike, Xweda yê mezin ji ji wî re zahf ihsanê di-ke.

# BI MÜFİD YÜKSEL RE LI SER KİTEBA "KÜRDİSTAN'DA DEĞİŞİM SÜRECI"

## Ali Karadeniz

**D**i vê demê de, li ser kurdan bi refan kitêb têne nivîsandin û weşandin. Ev pirbûn ji cîhetekê ve rind e; lewra şewqekê diavêje ser jiyanâ ku di tariyê de maye. Lê ji cîhetekê ve jî, dibe sebeba gumanan; lewra, çend libê wan kitêban ne tê de, piraniyan van kitêban bi destên kesên ecnebî û ne misliman ve hatine nivîsandin. Gava meriv ji van kitêban li hinekan dînihêre, meriv dibîne ku çarçîva objektîfîyê piçkî hatîye îhlalkirin. Yanê ew rohnîkirina ku meriv ji lêkolîneke îlmî dipê, rind na-xuye.

Ji vê cîhetê gava meriv li kitêba "Kurdistan'da Değişim Süreci" vedînihêre, tê dîtin ku ev kitêb, di nav lêkolînênu ku li ser tarîx û toreyên kurdan hatine nivîsandin de cîhekî girîng digire.

Loma me xwest em li ser vê kitêbê bi nivîskarê wê Müfid Yüksel re hevpeyvîn (reportaj)ekê çekin û pêşkêşî we xwendevanan bikin.

...

• **Meqseda we ji vê kitêbê ci bû û li gor we lêkolînênu mîna kitêba "Kurdistan'da Değişim Süreci" (:Seyra Guherînê**

li Kurdistan) wê ci fêdê bighînin kurdan?

• Ev kitêb li ser mesela içtîmaî ye. Min xwest ku di vê mesela içtîmaî de bi rihnayî were nivîsandin. Meqsedeke min a din jî; divêt ku mislimanek jî bi vê meselê elaqedar bûbûya û nîşan bikira ku em misliman jî di nav vê pirsê



de ne û jê ne dûr in. Dîsa min xwest, di mabeyna mislimanen de ev kitêb were xwendin û ji xeynî mislimanen kurd, mislimanen din jî pê elaqedar bibin; ci mislimanen radikal bin, ci mislimanen muhafezekar bin, ci mislimanen din bin, tev de pê elaqedar bibin. Meqsedeke min a din jî; iro li Kurdistanê orf û en'anek heye. Ev

en'ana bi hakîmiyeta îslamê çêbûye; yanê divêt ku mislimana bizanibûya ev çand, çandeke îslamî ye û kurdan ji tarîxa qedîm ve misliman bûne, di mabeyna mislimanen de, mabeyna medeniyet û çanda îslamî de iştîraka wan zahf çêbûye. Min xwest ez vê nîşanî mislimanen bidim.

Ko em werin ser fêda lêkolînênu wisa. Meriv dikare vê bibêje; xwendevan wê çanda xwe nas bikin, tarîxa xwe winda nekin. Lewra tarîxan kurdan bi îslamiyetê ve girêdayiye, eva gereke neyê ihmalkirin. Ji xeynî vî intellîjansiya kurd yê cepî dixwazin evî heqîqetê bi kurdan bidine jibirkirin. Meqseda min a rastî ev e ku kurd mislimanîya xwe, lewra ev ji bona wan heyat e, jibîr nekin, bi vî xwe bigirin.


• **Li Kurdistanê, bi te'sîra moderntiyê, di pir waran de guherîn çêbûne. Gava meriv vê guherînê bihelsengîne, ji bona kurdan, fêde û ziyana wê ci ye?**

• Di nava kurdan de binyadekî eşîrtî heye. Binyada içtîmaî û siyasî tev li ser qebîletiyê ye, yanê di kurdan de hakîmiyeta eşîran heye,

qewmekî eşâîri ne. Ev jî mabeyna kurdan de tevlihevî, hevnegirtin, muxalefet, nîza û mucadelê derdixe. Moderniyê vana kêm kirîye. Lêhemâ moderntî te'sireke dinê jî kirîye; en'aneke îslamî di mabeyna kurdan de heye, ev en'ana îslamî jî tête windakirin. Ev en'ana îslamî, li ser Nexşebendîtiyê û li ser Qadirîtiyê û li ser Şâfiîti çêbûye. Heta nuha medresan, tekyan (dîwan) li ser evan tiştan mabeyna kurdan en'anekî îslamî ava kirine. Ëdî ev jî hêdî hêdî tête windakirin. Yanê li nav kurdan de ko ev en'ane were windakirin, huwiyyeta wan a îslamî ko were windakirin, kurd di alema îslamî de starê nabînin. Mabeyna kurdan û mislimanê din wê vebe û wê xirabî û dijiminatî di mabeyna wan de derkeve. Ev jî ji bona kurdan baş nabe û ji bona mislimanê din jî baş nabe, ji wan re jî xirabî dibe.

Ko meriv li seyra vê guherîna di mabeyna kurdan de binihêre, bi tenê li ser "moderntiyê" nîne, lê li ser "ladîniyê" çêdibe. Yanê 'moderntî', di kirasê 'bêdîniyê' de xwe nîşan dide û kurdan ji dînê wan diqetîne. Di mabeyna kurdan de ev herketên millî, li ser ladîniyê hatine avakirin, zemînê wan li ser ladîniyê ye. Dixwazin kurdan ji qewmîn misliman ên xeynî kurdan bigetînin. Ev qetandin ji kurdan re ji felaketê pêvtir tiştékî nayne. Hanji vê cîhetê, moderntî tesireke menfî li ser kurdan dike.

**• Em dibînin ku ji sed-sala 19'an û vir de, kurdan timî serî hildane. Seroktiya hinek serhildanan began kirine, a hinekan jî şêx û mela kirine. Gelo**



### **meriv dikare bibêje he-defa van herdu cûr ser-hildanan jî yek bûye; me-selen meriv dikare bibêje ev herdu cûr serhildan jî tenê ji bo avakirina Kur-distaneke serbixwe bû-ne?**

- Di serhildana Bedirxan Beg de û di ya Şêx Ubeydullah de, ji ber ku wê çaxê hê di mabeyna kurdan de fikra milliyetê (nijadperistiyê), bi awayê ku li xerbê hebû, yan bi awayê ku di felsefa xerbê de, yan di siyaseta xerbê de heye, di mabeyna kurdan de zehf belav nebûbû, jixwe fikra milliyetiya îdeolojik li xerbê jî zehf kevn nîn e, lewra ev fikir, ji çaxa rasyonalistî de derketiye û piştî ihtilala Frensi ketiye siyesatê û ewili li xerbê belav bûye. Heta berî nuha bi pêncî salan jî di mabeyna kurdan de ev fikr zehf hindik bû. Di malbata Bedirxan Beg de, ev fikr bi zar û neviyên wî re hebû, lê bi xwe Bedirxan Beg bi fikra milliyetê serhildan nekirîye. Serhildana wî ji bo Kurdistaneke serbixwe nîn e. Wê çaxê selteneta Osmanî

dixwest nîzameke merkezî çêbike. Lewra ewîlî li Kurdistanê sîstemeke serbixwe hebû, yanê li Kurdistanê otonomî hebû. Siltan Mehmûd qerar da ku ew ê otonomiye rake û dewleteke merkezî li tamamê memalikê Osmanî çêbike. Bedirxan Beg jî ev qerar qebûl nekir.

Ji vê pêve, di navbera Bedirxan Beg û Asûriyan de mukadele hebû. Cun Asûrî û eşîretên din, heta wê rojê bacêñ xwe didan began, lê Asûriyan bacêñ xwe nema didan. Bedirxan Beg jî çû ser wan û ew tenkîl kirin. Zehf Asûrî di vê tenkîlê de hatine kuştin. Çend dewletên xerbê; weke Frensa û Ingiltere, zor dan dewleta Osmanî ku Bedirxan Beg ji vê tenkilkirinê biggerîne. Arteşen Osmanî jî diçin Bedirxan Beg digrin û sirgun û Stenbolê dikan. Yanê eslê serhildana wî beraleyhê Osmanîyan nebû. Lê zidê Asûriyan û zidê dewleta Iranê bû. Ev yek.

Serhildana Şêx Ubeydullah jî zidê Siltan Ebdulhemîd nebû. Jixwe wê çaxê te'sîra

Şêx Ubeydullah zehf li ser Kurdistanâ İranê hebû. Paşê dewleta İranê û dewleta Osmanî bi hev ketin ku li Şêx Ubeydullah tenkîl bikin û wî nehêlin. Şêx Ubeydullah mexlûb ket. Osmaniyan ew girtin û sîrgûn kirin. Yanê Şêx Ubeydullah jî ne ji bo Kurdistaneke serbixwe serî hildaye. Wê çaxê ji dewleta Uris teklîf hate jê re ku ji Osmaniyan biqete û bi Uris re ittifaqê bike, lê Şêx Ubeydullah ev teklîf red kir. Lewra wê çaxê şîura qewmiyetê di nav kurdan de zehf belav nebûbû. Çend kesên ku li Stenbole disezin; mîna zarokên Bedirxan Ben, yên Qedrî Cemîl Paşa û hwd tenê ev fîrk bi wan kesan re hebû. Lê bi yên dinê re qet' en ev tişt nebû.

Seyid Eli û Şêx Şehabeddîn jî zidê hikûmeta İtihad Teraqî bûn. Lewra İtihad Terraqî ji bona tirs û xatirê Uri-san, imtiyazê dida ermeniyan û neheqî li kurdan dikir. Serhildana pêşî ya ku li dijê neheqiyênu ku li ser kurdan çebûne, ev serhildana Seyid Eli û Şêx Şehabeddîn (Kalikê Kamran Înan) e. Ewan digotin, hikûmet ji tirsa Uris, imtiyazê dide ermeniyan, ermenî jî tezyiqê li ser kurdan dikin. Ji vê sebebê wan dana vê imtiyaz qebûl nekirin û li bajarê Bedlîsê serhildanekî kirin. Pişî salekê herdu jî hatin girtin û waliyê Bedlîse wan da idamkirin. Paşî Cemîl Çeto jî, ji bona ku heyfa wan hilîne, çend zabitên mezin yên Osmanî girt û wan da kuştin.

Şêx Seîd jî got va, ye xelîfetî rabûye, êdî dewleteke îslamî nuha nemaye. Tirk serbixwe ne, kurd jî xwe bi xwe mane. Gereke kurd bi xwe

êdî karê xwe bikin. Emniyet û baweriya kurdan bi hikûmetê nemaye. Yanê Şêx Seîd is-rara wî zehf li ser ve yekê çebûbû. Gotinekê jê neqil dikin, dibêjin Şêx Seîd gotiye: "Pişti min kurd dê dewleteke çekin, lêhemâa bilesef dê îslamî nebe."

#### • Şêx Seîd bi xwe dewleteke îslamî û kurdî dixwest?

• Dixwest. Şêx Seîd digot, yan em herin ser Enquerê bi tîrkan re hevkariyê bikin û Enquerê bixine desten xwe û dewleteke îslamî li ser xîlafetê tesîs bikin, yan em ê dewleta xwe ya îslamî çebîkin. Ko ew nebe, wê ev bibe. Hereketa Şêx Seîd wisa bû.

• Bi te'sîra terîqeta **Nexşebendî, li pir de-verên Kurdistanê medre-se hatine avakîrin û gelek mirovan li van medresana îlm xwendine. Lêhemâa bi-qasî ku tête dîtin, ev medresana di warê ramânê de pir kêm mirov gihandine. Di îlmê tefsîrê de, di yê kelamê de, di yê tarîx û edebiyatê de pir kêm alim derketine. Jixwe îlmên fennî hîc ne-hatine xwendin. Gelo ci-ma wisa bûye?**

• Beriya Safewiyan, mabeyna kurdan de zehf alim derketine. Yanê ci İbnî Teymiye be, ci Ebul Îz Elcezerî be (mesela kitêbeke Ebul Îz Elcezerî heye; Kîtabul Hiyel, li ser robotan hatiye nivîsandin), Ebu Siûd Efendi (Şêxulislamê Osmaniyan) be, wekî din Molla Goranî be, İbnî Esîr be, İbnul Cewzî be... hemû kurd in. Ko meriv li kutûbxanan binihêre, navê gelek alimên kurd meriv dibîne. Yan leqebê wan 'Kurdî' ye,

yan bi navê qebîla xwe ve têne naskirin. Mesela dibêjin Şêx Eli bîn nizanîm ci û ci El Kurdî, yan Şehrezorî, yan Dînewerî (ci alimên ji Dînewerê derketine, zehfîn wan kurd in). Ji xeynî vana ci Suxrewerdî be, ci alimên ji Geylanê bin, tev kurd in. (Şêx Ebdilqadirê Geylanî bi xwe kurd nîn e.) Lêhemâa pişti Safewiyan, hudûd di mabeyna İranê û dewleta Osmanî de hate kişandin, êdî çûn û hatin hate xetimandin. Lewra ew hereket, ew dinamîka çanda kurdan li ser Şamê, li ser Bexdayê û li ser İsfahanê bûye, irtîbata wan zehf bûye. Lewra minteqekî çûn-hatinê bûye; ji Anatolê, ji Qonyayê diçûne İranê, ji İranê dihatin Qonyayê, ji Şamê dihatin Erziromê... yanê Kurdistan ci-yekî çûn-hatinê bû. Pişti Safewiyan êdî hatiye birin, ew dînamîzma, ew hereketa êdî xelas bûye.


Pişti vê qutbûnê, înkıraz dest pêkiriye. Pişti qırnê 19'an êdî ev înkıraz pirtir bû; êdî îlmê riyazi (îlmê hesêb), îlmên fennî exlebên wan rabûn, lê edebiyat nerabû, bi erebî û bi farîsi helbest hatine nivîsandin, mabeyna melan de hê jî helbest têne nivîsandin. Ci li Kurdistanâ Iraqê, ci li deverên din, melan zehf dinivisiñin, lê nayêñ çapkirin. Ko werin çapkirin û we-rin weşandin, ew çax zehf rind dibe. Mesela Dîwana Şêx Ebdurrehmanê Axtepî heye, dîwanekê zehf xweş e. Dîwana Şêx Qedrî Hezin Dîwana İrfan heye, dîwanen kesen din nayêñ weşandin. Sê çarek ji wan têne weşandin, lê yên din nayêñ belavkirin, meşhûr nabin.

Wekî dinê, nuha medrese

zehf kêm bûne, çan modernî hatiye, mektebêن modern ve bûn e û ciwanêن kurdan raxbeta wan li ser medresan zehf nemaye. Sebebekî din jî, wezîfe nema bi destê wan diket. Yanê icaza medresan, mîna diplomayê miamele nema didit. Heta mekteba imam-xetibê, yan ilahiyatê neqedandana, nikarîbûn bibine waiz, yan imam, yan jî muftî. Mezûnên medresan, heta berya 65'an jî, ko di imtihanê de muwefeq bûbûna, dikarîbûn bibine imam, an muftî. Pişti 65'an qanûnekî derxistin û gotin ên ne mezûnê imam-xetibâ, an ilahiyatan bin, nikarin bibine imam an muftî. Ev qanûn deriyê rizqê mezûnên medresan li ber wan girt.

Sewiya medresan jî êdî hêdî hêdî kêm dibû; ji nehwe pêvtir îlmê melan nema. Pişti 80'eyî irtibata hinek melan bi hereketêن islamî re çêbû, bi vê sayê piçkî rewşa medresan rindtir bû. Êdî tefsîra Seyyid Qutûb, kitêbêن Seîd Hewwa, yên Îxwanîl Muslimîn hatine xwendin. Bi hereketa Iranê re irtibata wan çêbû, bi vê sayê tefsîra el Mizan a Tabatabaî li medresan hate xwendin. Léhemâ imkana wan a iqtîsadî kêm e. Îcar nîzameke rindtir hê ne-hatiye çekirin. Ev kitêbên nû jî, yên ku di çend medresan de têne xwendin, zidê kitêbên kevn in, ew jî nexweşiyekî di medresan de derdixin.

Çima di îlmê tefsîre de kêm mirov gihadine, mutefekkirêن dawa islamê çima hindik gihane? Lewra ev en'anewî ye; yanê ideolojî zêde neketiye nav wan. Bi rastî ev tiştekî xweş e jî. Lewra ne baş e ko meriv dawa is-



lamê bixe ser ideolojiyekê, ev temayuleke xerbî ye, temayuleke morden e. Lé ji melan re hişyarbûn jî lazim e, divê dunyayê nasbikin. Lé çend hebên ku dunyayê nas kirine, ew jî ji rê derketine, yan jî İslamiyetê bi dûr ketine, yan jî fikra reformîstî girtine. Yanê mîzaneke, rîyeke weset ji xwe re bibînin.

**• Hun dibêjin; 'lehça Norşînê, ji lehça Botan edebîtir e. Li gor ku wisa ye jî lehça Norşînê hatiye terikandin û bi propaganda kesen neteweperist, lehça Botan rewac dîtiye.' Bi xwe ez, di sebeba revacdîtina lehça Botan de, vê gotina we pir durust nabînim. Lewra heger iro di çapeme-niya kurdî de lehça Botan tête istîmalkirin, ji ber ku li gor herêmîn din, li vi herêmî nivîsandin pirtir bûye û rêzimana kurdî jî ji hêla Celadet Bedirxan Beg ve hatiye nivîsandiye, Celadet Bedirxan Beg jî ji Botî ye.**

• Li ser lehça Botan divê

ez vê bibêjim: Du lehçen Botan hene. Yek jê; lehça Hekariyê ye, meriv dikare jê re bibêje Behdinanî jî. Ev lehça Hekariyê û cîwarên wê; weke Bexçeseray û deverên din, ev lehçak ji ya Botan e. Yek din jî lehça Merdînê, yan lehça cenûbê Diyarbekrê, yan lehça Sertê û ya ku li Xerzan tête emilandin e. Di kitêbê de min lehça Xerzan qest kribû. Divê ku min ew aşîkar binivisanda, a rast ew xelet bû. Yanê qesta min ne tema ma lehça Botan bû. Mesela lehça Botana Şerqî; ci ya Beytuşbab be, ci ya Şîrnexê be, ci ya Wanê be, ew lehçekî xeyri edebî nîn e. Dîwana Mele Ehmedê Cizîrî, Şêx Ehmedê Xanî bi vê lehçê hatine nivîsandin. Léhemâ ji ber ku di nava Merdînê û Sertê de ereb zehf bûne, zimanê kurmancan jî bi ser erebî de diçe. Kurdên Urfayê jî û hetta kurdên Suriyê jî mîna ereban bi kurmancî xeber didin. Yanê mîna yekî ereb ku hînî kurmancî bibe û li gor xwe telafuz bike, kurdên wan deve ran jî wisa bi kurdî xeber di-

din. Lehça Diyarbekrê, Hezroyê be, yan a Sêrtê, Erûhê, Baykanê be, yan a Xelfetiye û Siwêregê be, zehf bi erekî dimîne.

Lêhemâ lehça Botan a ku Mela Ehmedê Cizîrî, Feqê Teyran, Feqî Reşîdê Hekarî û hwd pê nivîsandine, jixwe edebiyata kurmancî li ser wê lehçê ye, divê ku meriv bi rastî bibeje.

Îcar kitêb û dîwanên van aliman tev li medresa Norşînê dihatine xwendin. Ji ber vê xeberdan û nivîsandina Norşînê zehf edebî bûye. Jînan jî li medresan dixwendin; heta Xayetul İhtîsar, Şerhul Muxnî dixwendin û ji van kitêban pêvtir, kitêbên kurmancî jî tev dixwendin; Eqîda Îmanê, Nûbihar, Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî û çend kitêbên şerîtê, yanê 15- 20 kitêb dixwendin. Ji ber vê, kurmanciya wan jî zehf xweş bû. Lewra exlebê van kitêban mevzûn in, ji ber vê axaftina wan jî bi ser şê'rê ve diçe. Xweşbûna lehça Norşînê ji vê sebebê tête der. Mesela çend heb gundên dora Norşînê, ew jî mîna xelqê Norşînê ewqasî rind nekarin biştexilin. Lehça koçera jî lehçeve belîx û fesih e. Belê xezna kelîmân wan zehf nîne; bi hindik kelîman xeber didin. Lê kesen medresê zehf bi kelîmân wazihtir xeber didin. Mesela ko kitêbeke erebî bixwînin, gereke bi kurmancî izaha wê bikin, yan tercûma wê bikin. Mesela ji "el" (herfî tarîf) a erebî re nedigot "herfî tarîf", jê re digotin "tiştekî ew ê rengîn be". Kelîmân erebî re gereke kurdîya wan bidîtana. Ji ber wê, xezîna kelîmân zimanê kurdî dewle-

mend dibû.

Lê iro em dibînin ku kesen dawa kurdan dimeşînin exlebê wan bi kurdî rind nizanîn. Mesela ko li ser weşanê, li ser mecellan civînekê çekin, beyanatê xwe bi tirkî didin; nikarin bi kurdî xeber bidin. Hetta Apo bi xwe jî nikare rind bi kurmancî xeber bide. kurmanciya wî zehf hindike. Yê din jî wisa ne; ci Kemal Burkay be, ci yê din bin, zorê didine xwe gava ku bi kurdî xeber didin. Ji ber ci? Piştî 1970'ê kitêbên ku xwendin; hemû bi tirkî bûn. Tehsila wan a medresê jî tine bû. Xeberdana wan, xeberdaneke rojane û kêmkêlîmeyî ye. Li Atîna mehekê berê, li ser rojnamevaniyê civînek çê kirin, di wê civînê de bi tirkî xeberdan. Yewnaniyan gotin, hun behsa heqê kurdan û zimanê kurdan dikin û hun bi tirkî xeber didin. Keskî ku ji were bibe manî' jî nîn e, cîma hun bi kurdî xeber nadîn? Gotine em bi kurdî nizanîn.

**• Ev ji bo hemû kurdan ne wisa ye? Kurd hemû ji xwendin û nivîsandina zimanê xwe mahrûm in.**

• Yê li medresan xwendibin ji xwendin û nivîsandinê ne mahrûm in.

Ew kitêbên medresê yê qedîm gereke werin xwendin. Îtelijansîa kurdî, mîna

Sazgeha Zimanê Tirkî (Türk Dil Kurumu) taze kelîman çê dikin û kelîmân kevin jî, ku ew bi xwe nizanîn, dihêlin û didine jibirkirin. Cîma ku tehsila wan a medresan tineye, ji bona vî awê, ew kelîmân kurdî di medresan de têne emilandin, nizanîn. Îcar kelîmân taze ji ber xwe derdixin.

**• Hinin tişt hene jî mecbûrî ji wan re nav tête çêkirin.**

• Lêhemâ evana kelîmân farisî û erebî yê ketine kurdî jî derdixin. Xusûsên ên erebî derdixin. Mesela dibêjin "Reveçûna Pêxember", li şûna "Rêveçûn" ê "Heyata Pêxember" tête emilandin, li ba me wisa dibêjin. Di medresan de ferhengekî İslâmî heye. dixwazin ewî rakin. Ji bona vê, kelîmân erebî derdixin. Kelîmân erebî jî di klasîkên kurdî zehf hatine emilandin. Mesela Mele Xelîl Es'erdî nêzîkî sîh kitêbên wî hene, ji vana panzdehîn wan bi kurmancî ne, yê din erebî ne. Heger kelîmân erebî bêne derxistin, em dê çawa ji van kitêban istifade bikin. Ko meselen kelîmân erebî ji farisî û kelîmân latînî ji îngîlîzî werin derxistin, farisî jî û îngîlîzî jî bi kérî tiştekî nayen û bi wan ilm û ferheng çenabe.

**• Em pir spas dikim**

• Ez pir spas dikim, Xwendî ji we razî be. •

## KITÊBÊN ME YÊN NÛ

- Nimêj Dikim
- Bediuzzaman'ın Hayatı
- Bediuzzaman'ın Volkan Yazları

Jî navnîşana Nûbihar bixwazin

# HEBÛN Ü TENDURUSTÎ, ÎMTÎHAN IN

## Gulbehişt Şirnexî

**D**i hedîseke Pêxemberê me de, derheqê sê merivên kêmlaş de, bûyerek tête şîrovekirin.

Cenabê Yezdan, ji bo îmtîhankirina wan hersê merivana, ferîstehêkî dixînê dilqê mirovekî û ji wan re dişîne. Ev hersê mirovên kêmlaş, ji wan yek "keçel", yek "kor", yê din jî rûspîçok bûye.

Cenabê Yezdan, pêsiyê ferîsteh ji wî yê rûspîçok re dişîne. Ferîstehê qasid ê Yezdan, ji wî dipirse:

"Di vê dunyayê de daxwaz û merema te ya pêşem çiye?" Ew dibêje:

"Daxwaza min ev e ku, bila ev deqspiyyê serçavêن min wenda bibin û bila ez rûçeleng û bedew bibim." Ferîsteh, lepêن xwe di serçavêن wî dide. Bi destûr û destdayina Yezdan, heman wê demê de çermê rûyê wî mirovî ji wan deqspiyyân xelas dibe. Rûçikekî gelek xweşik derdikeve rastê.

Dîsa ji wî zilamî dipirse:

"Tu pirtir ji kîjan malî hez dikî?" Ew zilam dibêje ku:

"Ji hêstirê pir hez dikim." Wê gavê, dîsa bi destûra Xwedayê mezin, hêstireki

avis, yeke dehmehî dide wî û ji cem wî dûr dikeve.

Dûv re, tête bal mirovê serkeçel. Ji wî jî dipirse:

"Tu bêje, di vê dunyayê de merem û miraza te çiye?" Keçel dibêje:

"Ez por û pirçekî gelek



xweşik û girs dixwazim." Ferîsteh dîsa dipirse:

"Tu pirtir ji kîjan malî hez dikî?" Zilamê keçel dibêje: "ji çelekê". Xwedayê bilind, bi wasita wî ferîstehî serê wî ke-

çeli pordar dike û çelekeke avis dide wî. Ferîsteh: "Fermo, bila berxwedar û bereketî be." dibêje û ji cem wî jî dûr dikeve.

Ferîstehê qasid, içar diçê bal mirovê kor. Merez û merema wî dipirse. Ew dixwaza ku çavêن wî vebin û ronîk bibin û ji malan ji "mêşin" ekê dixwaze. Ferîsteh xwestinêن wî jî didêye. Çavêن wî vedibin û digihêje mêsinek avisin. Ferîsteh, ji hinda wî jî dûr dikeve. Ji zemanekî kurt şûn ve, hêstir, çelek û mêşin dizêن û zêde dibin, dibin weke garaneke se-walan. Xwediyê wan se-walan, gelekî samandar û dewlemend dibin. Wexta ku ev rewşa qewimî, Cenabê Yezdan wî ferîstehê qasid, dixînê dilqê mirovek i xizan û dîsa ji wan re dişîne; da ku ewan yeko yeko ziyaret bike û biceribîne.

Pêsiyê dihere hinda zilamê ku di wextê de rûspîçok bû û jê re dibêje:

"Ez xizan im, qewet û hêza min nemaye. Ji bo xatirê wî Yezdanê ku rûçikê te xweş û bediwandiye, hêsti-rekî bide min ez bi xwe re bi-

bime malê, pê ïdare û aboriya xwe bimeşînim." Ev zilamê nankor, bi rûtahî û pozobilindî dibêje: "Naxêr, yêñ bide, divêt hînde nexwaze". Ferîsteh dema ku rewşa wî ya berêmîn tîne bîra wî; "divêt wê rindiya ku li te bûye, tu ji-bîr nekî" dibêje. Ev zilam dest bi înakarê dike û dibêje:

"Ev mal û sewalana, hemû ji bavê min ve mane". Ferîsteh: "Naxêr, tu derewa dikî; bila Yezdan, te bizivirîne halê te yê berê" dibêje û li wî nifiran dike. Dawiyê, ji cem wî diqete û wenda dibe.

Îcar diçe cem zilamê ku ji keçeltiyê xelasbûye. Ji wî jî mêsinekê dixwaze. Ji devê wî jî wek zilamê ewilîn bersîv distîne. Nifirekî li şexsê wî jî dike; da ku Yezdanê Berz, wî jî têxîne rewşa berê. Ji cem wî jî dûr dikeve û diçe cem zilamê kor.

Ji zilamê kor jî, lava dike, da ku bila mêsinekê bidêye; da ku goştê wê bixwe. Zilamê kor wiha bersîv dide:

"EZ berê hem kor hem jî xizan bûm. Yezdan, hem çavên min vekir, hem jî ez kirim dewlemed. Evanîn hemû dayîn û bexşen Xweda ne. Fermo, tu kîjanê dixwazî ji xwe re bineqîne û bistîne; tu serbest i."

Li hember vê spasdarî û comerdiya vî zilamî, ferîsteh wilo bersîv dide:

"Bila malê te yê te be. Ev bûyer, îmtîhanek bû, ci bextiyarî ji te re ku te ev îmtîhan qezenc kir. Yezdanê Teala ji te razî be. Lê ci mixabin ku hevalên te wenda kirin; mal û sewaled wan, bû bela serê wan. Lewra, hemû ji destê wan hatingirtin û li wan bixwe jî xezebî û cansotiya Yezdanê Teala qewimî."•

# PÊXEMBERÊ DILOVAN

## Xelîl Amedî

**R**oja ku bajarê Mekkê tête fetihkirin, qasidê Yezdanê Berz Hezretî Muhemmed (Silav û dolavaniya Xwedê ya bêhed li ser wî be), wiha xîtab û qewmê qureyşî yê ku cewr û cefa ji wan dîtibû, kîribûye.

Her wekî we îman û bawerî nedianî, bi ser de li îmananiyan jî, ti cewr û cefayek nedima ku we bi wan nedikir. We ez û hembawerên min mecbûrê hîcret û koçkiranê hiştin; we, em ji war welatê me dûr û cuda xistin. We gelek hevalbendên min yên hêja û apê (mam) min Hemze yê hogir kuştin. Lê gelek spas û stayış ji Xwedayê min re, ez bi tenê ne-hiştim; arîkariya xwe li min kir, serfektin nesîbê min kir; hun jî dibînin ku iro serketî û xalibiyet di destê min de ye. Vaye ez gihadim meram û daxwaziya min ya herî mezîn ku ew jî fetihkirina Mekkê bû. De niha hun bibêjin, vê gavê miameleyek çawa ji min dipê?

Li hember vê lêgazina Pêxemberê rehmetê, ew kesên ku cewr, cefa, tade û şkence li qasidê Yezdan û li kesên bawerbirên Xweda kiribûn, li hember wan şûr kişandibûn û bi dijwarî şer kiribûn, niha gelek poşman bûbûn. Stuyê wan bi ber wan de xûz bûbû, di nav xwîdanê de diqerqîlin û dilerizîn... Neçar ma-bûn, wilo dest bi peyvê kirin:

"Ey Muhammed, em jî her weke birayên nebî Yusif in."

Belê, çawa ku, Nebî Yusif, ji hêla birayên xwe ve hatibû avêtine bîrê, xiyanet lê hatibûkirin, lêhema dema ku Nebî Yusif bûye serok û fermandarê Misrê, ew hemû ef û bexşandibûn. Her wiha, qewmê qureyş jî, di vê manê de, ji rîberê me re dibêje:

"Em jî, iro ji te kerem û bexşandinê dipê."

Pêxemberê bexş û dilovaniyê, li pêş wan, vê gotina mezîn ya rehmtije dibêje:

"Belê, min jî hun iro (bi hemûşkî) bexşandin."•

# EM MISLIMAN IN HEWAR!

Hey hewar e hey hewar e ka binêrin va şîmal  
Tev xirabû, wa nehiştin tê de însan û helal  
Sengeser banî dike Qeledizê qîr û girî  
Dijmina xanî li me wêran kirin xwişka delal  
Wa keç û kur can û kal û zar û şîr û pîrejin  
Derkirin xistin eva dola li wa reş bûye hal  
Bêsitarin berf û bandev ser de tê rût û zelût  
Bêqirar in wa nemaye ser dinê de milk û mal  
Lê dizivrînê ji nû xwişka pepûk û dil bi kul  
Nê e'jî wek te bi nalîn û divê rê de heval  
'Alemê çavê xwe girtine ji vê gunhê mezin  
Ros û Emrîk û Ferensa, meclisulemna betal  
Ka hiqûqê ku dibêjin bonê însana ne ew  
Bo li vêdê nameşin? Rêkê de nînin kend û pal  
Ka zemîrê 'alemê, bo mirye pê lê bûne pîj  
Ew ji bo vî milletî tev bûne kor û gêj û lal  
Ka mislimanê dinê û komelê îslamiyê?  
Bo ci deynakin eger wa zanîba dînê zelal?  
Şâşikê wa rengê destara li dora sifreya  
Dîn û îmana didin pê nav û malê ne helal  
Dîn û îmanê gişa dê hilweşin ser xwarinê  
Lê di dewsê de berikê wa giran in ey heval!  
Şêx û axa û mela hin bûne tûlê hakima  
Dîn li cem wa qet nema dînê ewa tev qîl û qal  
Wa gişa dînê xwe berda lê nema dibne xwedî  
Ketne bin destê xwedî dînar û dolar û riyal  
Wa bi navê dîn belav kirne di nêv xelkê de pir  
Îftira'i û şehde zorî, gotinê pûç û betal  
Dînfiros û nanxwerîn rengê segê ser dawata  
Wa te dî hukmê xwe danî ser me bê pirs û sual  
Wa ci xem nîne b'hezara bêne kuştin bêguneh  
Ku bi dest bêxin ji bo vê gotinê gazek qepal  
Em di nêv xelkê xerîbin ma çikin bextê me ye  
Bextekî reş ser me danî tar û teng û tirş û tal  
Yûsivî dengê te ket, ta kengî dê kî qîreqîr  
Bo divêtin dengê topa, dê çikit ev nalenal

**Mela Mehmûdê Yûsivî**

# FERHENGOK

**A**  
**Aborî:** İktisat, ekonomi, genel  
**Agahî:** Bilgi, idrak, vahiy  
**Alüle:** Dar sokak, yan sokak  
**Anegor:** Kendine göre, tâkatınca  
**Ango:** O halde, şu halde, yâni  
**Arastin:** Süslemek, donatmak  
**Avahî:** Bina, yapı  
**Avis:** Hamile, gebe  
**Awa:** Tarz, biçim, stil  
**Awir:** Sert ve dikkatli bakış  
**B**  
**Bal:** Yan, taraf  
**Bedew:** Güzel, muhteşem, şuh, yakışıklı  
**Belg:** Belge  
**Ber'eks:** Aksine, tersine  
**Beraleyh:** Aleyhinde  
**Berdar:** Üretken  
**Berêmîn:** Önceki hal, ilkinci  
**Berfireh:** Geniş, ferah, enli  
**Berhem:** Eser  
**Berkenar:** Kitapların boş kollarına yazılan notlar, derkenar  
**Bername:** Program  
**Bersiv:** Cevap  
**Bervajî:** Karşı, karşıt, ters taraf  
**Berwdxar:** Teşekkür ifade eden bir kelime  
**Beş:** Hissse, pay, kısım  
**Bêhempa:** Eşsiz  
**Bêjing:** Elek  
**Bêtêfriq:** Ayırmaksızın  
**Bêtewane:** Korkusuzca, massumca  
**Binyad:** Temel, esas  
**Biriqîn:** Parlamak, parıldamak  
**C**  
**Cansotî:** Can yanması, üzüntü  
**Caw:** Pamuklu bez, bez  
**Cewr:** Cebir, zor, haksızlık  
**Cil:** Elbise, çamaşır, örtü  
**Cihet:** Yan, taraf, yön  
**Ç**  
**Çak:** İly, güzel, şerif, asıl  
**Çelek:** Inek  
**Cindik:** Zıplama, sıçrama  
**Çong:** Diz  
**D**  
**Dehmehî:** On aylık  
**Demezirandin:** Kurmak  
**Deqspî:** Vücutta oluşan beyaz noktalar, bir çeşit hastalık  
**Dêr:** Killise  
**Digel:** İle, ...yle, beraber  
**Dilq:** Cübbe, kılık  
**Diyar:** Belli, aşıklar  
**Dûpişk:** Akrep

**E**  
**Ecnebi:** Yabancı  
**F**  
**Ferişte:** Melek  
**Fermî:** Resmi  
**Ferbûn:** Bir şeyi öğrenmek  
**Fêrgeh:** Kurs, medrese, öğrenim yeri  
**G**  
**Garan:** Sığır sürüsü  
**Gazin:** Sitem, serzeniş, şikayet  
**Giring:** Mühim, önemli  
**Guldank:** Vazo, saksı  
**Guman:** Şüphe  
**H**  
**Havil:** Çare, çıkar, yol  
**Hemin:** Zaten, evvelce, şimdiden  
**Herêm:** Bölge, taşra  
**Heştir:** Deve  
**Hevalbend:** Dost, arkadaş  
**Hevkarî:** İşbirliği  
**Hevrîst:** Ardiç ağacı  
**Hewcedarî:** İhtiyaç, gereksinim  
**Heywl:** Gayret, çaba, çabalama  
**Heyam:** Çağ  
**Heyf:** Öc, intikam  
**Hinkirin:** Öğretmek, öğretmesini sağlamak  
**Hovitî:** Vahşet, aptallık  
**Hunandin:** Örmek, kurmak, örgütülemek  
**Hûr:** Ufak, küçük, minik  
**İ**  
**İbtîdaî:** İlkokul  
**İdâb:** Lise  
**İmtiyaz:** İmtiyaz, ayrıcalık  
**Înkîraz:** Sönmek  
**Îsandîn:** Parıldamak  
**J**  
**Jîjo:** Kirpi  
**K**  
**Kalîn:** Melemek  
**Kambax:** Mutlu  
**Karûbar:** İş güç  
**Kâşane:** Yalı  
**Keçel:** Kel  
**Kehêl:** Bir cins at, bîd tür at yürüyülsü  
**Kevneperist:** Gerici, muhabazakar  
**Keyfiyet:** Nitelik  
**Kêmlaş:** Sakat, vücutdunun bir parçası eksik olan  
**Kirdar:** Eylem, fil  
**Kitêbêñ rêzê:** Medrese müfredatı anlamında  
**L**  
**Lat:** Kaya, parça, parsel  
**Lerzîn:** Titremek, sallanmak  
**Lêkolîn:** Araştırma, inceleme  
**M**  
**Mabeyn:** Ara, arası  
**Mamoste:** Öğretmen, profesör, usta

**Mayinistan:** Mayın tarlası  
**Mercî:** Otorite, kaynak  
**Mêjveyî:** Geçmişe ait  
**Mêşin:** Koynun  
**Mêtin:** Emmek  
**Mîr:** Bey  
**Mizgefî:** Camî  
**Muasir:** Çağdaş  
**N**  
**Navend:** Merkez, orta  
**Newaxtin:** Çalmak, saz çalmak  
**Nifir:** Beddua  
**Nirxandin:** Değerlendirmek  
**Nîhayî:** Nihai, sonunda  
**Nîvçê:** Yarım, yarım yamalak  
**Nîza:** Çekilisme  
**Nûjen:** Modern  
**P**  
**Parastin:** Muhafaza etmek, korumak  
**Parêzger:** Korucu  
**Paşeroj:** Geçmiş, mazi  
**Pejirandin:** Kabul etmek, tercih etmek  
**Perpitandin:** Çırpinmak, tartaklamak  
**Perwerde:** Eğitim  
**Pêlav:** Su dalgası  
**Pêstirk:** Pedalı ayakla çevrilen arabâ  
**Pêşbazî:** Yarışma, musabaka  
**Pêşber:** Ön, huzurda  
**Pêşdexîstin:** İlerletmek  
**Pêşeroj:** Gelecek, atı  
**Pêşkêş:** Sunuş, arz, takdim  
**Pêwend:** Alaka, ilgi  
**Pez:** Küçükbas hayvanlar  
**Pîskdar:** Ortak  
**Pîştgîrî:** Taraf tutma, arka çekme  
**Pitir:** Daha fazla  
**Pîroz:** Zafer, kuthu, mubarek  
**Ponîjîn:** Düşünmek, dalmak, uyúklamak  
**Pozbilind:** Kibîrli, burnu havada  
**Pûşik:** Bitki yaprağı  
**Q**  
**Qewî:** Kuvvetli, sağlam  
**Qîrn:** Çağ, yüzyıl  
**Qonax:** Konak, saray  
**Qurneşîkestî:** Kırık musluklu  
**R**  
**Rakişandin:** Çekmek, taşımak  
**Raman:** Düşünce  
**Ratîb:** Medresede okuyan öğrencilere tahsis edilen yemek  
**Ref:** Raf  
**Rex:** Yan, taraf  
**Rêbâz:** Üslûp, metod  
**Rêbiwer:** Yolcu, gelip geçen  
**Réxistin:** Sermek, yere sermek

**Ronakbîr:** Aydın  
**Rûbirû:** Yüzüuze  
**Rûçeleng:** Güzel yüzlü  
**Rûçik:** Sima, yüz  
**Rûtahl:** Ekşi suratlî  
**S**  
**Samandar:** Sağlıklı, sağlık sahibi  
**Serbixwe:** Bağımsız  
**Serdeşpêk:** Başlangıç  
**Serkeçel:** Kel kafalı  
**Serkeftin:** Başarı  
**Sewal:** Davar, koynun ve keçile verilen ortak ad  
**Seza:** Uygun, yaraşır  
**Siyanett:** Hürmet, saygı  
**Spas:** Teşekkür  
**Spehîti:** Güzel, hoş  
**Stayîş:** İbadet, tapma  
**Stran:** Şarkı, türkü  
**Suxte:** Din öğrencisi, talebe  
**S**  
**Şagirt:** Öğrenci, dini öğrenci  
**Şareza:** Yetkin, becerikli, aydın  
**Şerh:** Açıklama, izah  
**Şirove:** Yorum  
**T**  
**Talîm:** Öğretim  
**Tarixa qedîm:** Önceki tarîh, eskiden beri anlamında bir deyim  
**Taybetî:** Özel  
**Têgîhiştin:** Anlamak, idrak etmek  
**Temaşe:** Seyir, bakma  
**Teniş:** Yan, taraf  
**Tenkîl:** Baskı, ezivet  
**Terdîd:** Tereddüt  
**Tereke:** Öluden geriye kalan, miras  
**Tewanber:** Suçu  
**Tezwîr:** İftira, aldatma  
**Tekili:** Karışma  
**Tékûz:** Sade  
**Tore:** Töre  
**V**  
**Vejandin:** Yaşatmak, diriltmek  
**Vêca:** Bu sefer, bu kez  
**W**  
**Wergirtin:** Glyinmek, üstüne almak, önlünü almak  
**Weza:** Zayıf  
**Wêjevan:** Edîb, edebiyatçı  
**X**  
**Xam:** İşlenmemiş, ham  
**Xizan:** Yoksul  
**Xoşevîst:** Azlız, sevgili, sayın  
**Xulase:** Özet  
**Xûz:** Kambur  
**Z**  
**Zaniyarî:** Bilimsel, ilmi  
**Zexim:** Sağlam, kuvvetli  
**Zêrkurtan:** Altın semer  
**Zîn:** Eyer, at eyeri

# KITÊBÊN EM BELAV DIKIN

## (DAĞITIMINI YAPTIĞIMIZ KİTAPLAR)

### Kitêbên kurdî (Kürtçe kitaplar)

• Rîsala Biratiyê (Uhuvvet Risalesi) .....	15.000
• Rîsala Biratiyê (Bi tîpên erebî) .....	15.000
• Peyiva Bîst û Sêyemîn (23. Söz).....	15.000
• Peyivén Piçûk (Küçük Sözler).....	20.000
• Nimêj Dikim / Komisyon (Kuşe) .....	35.000
• Nimêj Dikim / Komisyon (Spî).....	30.000
• Dîwan / Mele Ehmed Cizîrî.....	70.000
• Doza Jin / Hiseyn Elî Başar .....	15.000
• Ferheng (kurdi-tirkî, tirkî-kurdi) / D. Izoli.....	195.000
• Ferheng (zazakî-tirkî) / Malmisanj .....	100.000
• Mamoste Seîd Norsî (Soranî, bi tîpên erebî).....	40.000
• Mewlûd / Mele Ehmed Bateyî .....	35.000
• Nalînê Min / M. Şakir Koçer.....	10.000
• Nûbar / Ehmed Xanî.....	25.000
• Baran / A.Qadir Botan .....	10.000

### Kitêbên tirkî (Türkçe kitaplar)

• Bediüzzaman'ın Hayatı / Abdurrahman Nursi .....	20.000
• Şırnak Baskını / Osman Resulan.....	20.000
• Aydınlık ve Dindarlık / Abdulkerim Suruç (Çev.Sabah Kara).....	20.000
• Ayet Yorumları / Ali Seriati (Çev. Sabah Kara) .....	30.000
• Dini Düşüncenin Yeniden Kurulması/A.Kerim Suruç (Çev.Sabah Kara).....	20.000
• İllerici Gericilik / Abdulkerim Suruç (Çev.Abdullah Kutlu).....	15.000
• Peygamberler Aydinlarının Önderleri / A.Kerim Suruç (Çev.Abdullah Kutlu).....	20.000
• Zamanın Zeynebi / Zeyneb Burucerdi (Çev. Zafer Fırat).....	20.000

### Kitêbên erebî (Arapça kitaplar)

• Lemalar (el-Leme'at).....	120.000
• Mektubat (el-Mektûbat).....	120.000
• Sözler (el-Kelîmat).....	140.000

**Kitêbên li jor, bi hundir, bi bîst ji sedî (20 %) erzanî; lê bi derve, bêerzanî têne şandin. Yêñ ku hun dixwazin, bihaya wan hesab bikin, ji mecmûa bihayê, 20 % kêm bikin, baqiyê li hesabê jêrê razînin û fotokopîyeke pela razandinê, bi mektûba xwe ya ku we navê kitêban têde nivisandiye, bisînin navnîşana kovara me. Mesrefa postê li me ye.**

(Yukarıdaki kitaplar yurt içine % 20 indirimle, yurt dışına ise indirimsiz gönderilir. İstediğiniz tutarını hesaplayın, toplamdan % 20 düşün, geriye kalan tutarı aşağıdaki hesaba yatırın ve alındı belgesinin fotokopisini, istediğiniz kitapların isimlerini ihtiva eden mektupla birlikte dergimizin adresine gönderin. Posta masrafı bize aittir.)

### JIMAREYÊN HESABÊ (HESAP NUMARALARI):

**Li hundir** (Yurt içi): Postgiro (Posta Çeki): Süleyman Çevik, 658265

**Li derve** (Yurt dışı): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

### NAVNIŞAN (ADRES):

**Nûbihar**, Kızılaşı Cad. Kuriş Apt. No: 51/3, Fatih / İstanbul  
Tel: 533 75 88 Faks: 524 00 38

